



Danerê Rojnameya pêşî ya Kurdî Miqdad Mîhed Bedirxan

# Armanac

Hejmar, No: 143  
Çiriya Pêşîn  
October 1993  
Buha - Price  
15 SKR, 3 DM

Rojnameya Mehane

Bûyera Licê, teror û cînaletên qesasnediyar

## Li Kurdistanê xwîn diherike

✓ Dewletê 3 rojan Licê da ber top û tanqan. Licê şewitî, bi dehan kes hatin kuştin

✓ Komîta Êwlekariya Netewî ya Tirkiyê bi-ryara gurkirina terora dewletê da.

✓ YEKBÛN: "Ji bo tol stendîna kuştina gundî û zarokan zerarê dide doza gelê me".



Dewleta Tirkiyê gelê Kurd bi giştî daye ber tank û topên xwe (Foto: Berbang)

Vê mehê li Kurdistanê xwîn herikî. Şerên di navbera hêzên dewletê û gerilayên PKK de her roj bi kuştina çend eskeran, bi şehîd ketina çend xortên Kurd dom dîke. Şewitandin û qetlîamên gundan di vê mehê de piraniya wan jin, zarok û pîr bi sedan can girt. Bi dehan mamoste hatin kuştin û dibistan hatin şewitandin.

### Di 40 rojê de li dor 350 kuştî

Di 2.10.1993'an de hêzên dewletê ji ber ku gundê Vartimîsê piştigirîya PKK'ê dike da ber topan, di netîcê de ji malekê mêr û jinek û 7 zarok hatin kuştin. Di 4.10.1993'an de li Midyatê muni-

busekê pêl mayinê kir, bi teqîna mayinê re 27 kes hatin kuştin, 8ji wan zarok bûn. Roja 6'ê Çiriya Pêşîn, PKK'ê avêt ser du gundên Baykanê, ji ber ku peyayên wan milîsê dewletê ne gundî gulebaran kirin 11 zarok, 9 jin, 33 kes kuştin. Di 7.10.1993 de hinekên ku huviyeta wan nediyar avêtin ser gundê Mîgranê ku girêdayî Çunguşê ye bavek û du zarokên wî kuştin. Roja 23.10.1993, PKK'ê ji ber eynî sedemê avêt ser gundekî Şîrwan'ê 14 zarok, 8 jin 22 kes kuştin. Roja 25.10.1993'an PKK avêt ser gundê Yavî ku girêdayî qeza Çatê ye,

qehweyek gulebaran kir; 39 kes hatin kuştin. Her di eynî rojê de PKK, li gundê Bedlîsê û Diyarbekirê 6 mamosta kuştin. Li ser rîya Bîngol û Elezîzê 4 kes hatin kuştin. Ji 20'ê Îlonê heta 10'ê Çiriya Pêşîn, di navbera 20 rojan de li Kurdistanê 221 kes hatin kuştin. Ji vana 30 kes li bajarên hatin kuştin û qesasê wan ne diyar in.

### Girtin û terora psikolojîk û fikrî

Dewlet ji aliyekê ve ji şîdet û terore şikayet dike, lê li alî din ji bo teror û şîdetê firehtir û gurtir bike hemû îmkânên xwe seferber

dike. Ew mueseşe û kesên xebata demokratîk û legal dikin ji nesîbê xwe ji vê terora dewletê digrin. Heta dewlet wan teşvîkî serê çiyar dike û bi zanebûn riyên demokratîk û legal dixitîmîne. Serokê DEP'ê Yaşar Kaya hîn di girtîgehê de ye. Serokê Beledîya Hezoyê (Kozluk) Abdullah Kaya ji ber beyanek dabû rojname Ozgur Gundemê, hat girtin. Ahmet Zekî Okçuoglu ji ber nivîseke xwe, 20 meh ceza girt.

Li gelek bajarên Kurdistanê rojname nayên firotin, qedexekiri-

Dûmahîk r. 11

## Li dijî têkoşîna gelê Kurd fermanên nûh

Piştî bûyera Liceyê, hukûmeta Çiller û Karayalçîn li ser daxawaza Erkanî Herb qanûnên li dijî têkoşîna neteweyî û demokratîk a Kurdan ku bi navê "Qanûna li dijî terore" tê bi nav kirin, bi lez û bez spart Meclîsê. Ku ev ferman bi vî awayî di Meclîsê de derbas bibe, wê ji esnaf û şofêrên Kurd re cezayên giran, ji berpirsiyarên rojname û kovarên Kurd re ji tavilê cezayên hefsê û cezayên pere bîne. Gelê Kurd wê tevayî li hember bûyerên ku li Kurdistanê biqewime, bêdeng bimîne û li dijî zor û zulma dewletê stuyê xwe xwar bike.

Li gor fermana ku nuha di Meclîsa Anqerê de ye, dê esnaf û şofêrên Kurd nikaribên heqê xwe yê demokratîk bi kar bînin. Heke esnaf û dikan-darên Kurd ji bo protestoyekê dikanên xwe û şofêr ji qontaxa trîmbêlên xwe bigrin wê ji salekê heta 3 salan cezayê hefsê ji wan re bê dayîn û dikana esnaf 6 meh ji ticaretê û tirimbêla şofêr ji 6 meh ji trafikê men bibe.

Rojname û kovarên ku propaganda cûdaxwaziyê bikin wê ji 200 heta 500 milyon Lîreyê Tirkiyê cezayê pere bidin. Dê kovar û rojname ji 3 rojan heta mehekê bîn sekinandin.

Ji xwe berî vê qanûnê ji berpirsiyarên rojname û kovarên Kurdan di bin êrişên dewletê de bûn. Dewlet her roj cezayên hefsê û cezayên pera dide wan. Berpirsiyarên Azadî, Newroz, Ozgur Gundem bi salan cezayê hefsê û bi sed milyonan cezayê pere girtin. Ji Berpirsiyarê Giştî yê Medya Guneşî Osman Aytar re du sal cezayê hefsê û 250 milyon cezayê pere hat dayin. Berpirsiyarê Rojnamê Salih Bal 6 meh cezayê hefsê û 50 milyon ji cezayê pere xwar.

Xaleke dina vê fermanê ji ew e ku yê ku rêxistinên illegal ava bikin 10 sal cezayên hefsê bistînin û 500 milyon ji cezayên pere ji wan bê stendin. Yê ku alîkariya van rêxistinên illegal bikin, pere bidin wan, piştigirî û popagandeya

Dûmahîk r. 11

## Swêdî li Duhokê aşekî modern ava dikin

Piştî xebata têkilî û çend civînan Komela Kurd li Östersundê li Swêdê û Komîta Swêdî ya mafên mirovî yê gelê Kurd, di 22.10.93'an de, bi rojname, radyo, partî, xwendîgeh, dêr û rêxistinên civakî re civînek çêkirin. Di civînê de Partiya Muhafezekar, Partiya Gel, Sosyal Demokrat û Partiya Çep beşdar bûn. Partiya Xiristyanên Demokrat ji bi biryarên civînê re ye. Civînê biryar da ku ji bo avakirina aşekî li Dihokê 150 hezar kiron pere berev bikin. Wê navê aşê ji wek navê gola li Östersundê ye bê danîn. "Storsjökvamen" (Aşê Gola Mezin) Ji nuha ve hinek pere di postgîroya komîtê de civiyaye. Wê hemû partî û organizasyon ku li gel hev biryar girtine ji endamên xwe û gelê Jamtlandê pere bicivînin. Kampanya wê di Newroza 1994'an de bi dawî bibe. Avakirina aşê ji wê di sibatê de dest pê bike.

Li ser vê xebatê me bi serokê Komela Kurd li Östersundê û endamê Komîta Swêdî ya ji bo



Grûba Swêdiyan li Kurdistanê Başûr

mafê mirovî yê gelê Kurd li Jamtlandê Rociwan Yeşil pirsî ku fikra avakirina aşê çawa li cem wan çêbû.

"Havînê em li gel hin mamosteyên Swêdî çûn Duhok û Zaxo û Bamernê, piştî ku me rewşa wê derê dît ev fikir bi me re çêbû. Dema ku em vegeryan Swêdê li gel Komelê û Komîtê

me biryar girt û me dest bi kampanyayê kir.

Ji bo her kroneke ku em berev bikin, dê SIDA 3 kronan bide me, yanî 250 hezar kron di esasê xwe de dibe 1 milyon.

Komele piştî avakirina aşê wê bixebitin daku Dihok û Östersund bibin du bajarên bira.

Li Östersundê konserek li dijî

Komîta Swêdî û Komela Kurd li Östersundê kampanyayek berfireh dime-şînin da ku bikaribin aşekî mezin bi navê Aşê Gola Mezin li Kurdistanê Iraqê li bajarê Duhokê ava bikin.

Em ji hemû Kurdên ku li Swêdê dijîn alîkarî dixwazin!

Li ser navê Komîta Swêdî ya Parastina Mafê Mirovî Leqê Jamtlandê  
Sigrid Ricardsson

Li ser navê Komela Kurd li Östersundê  
Rociwan Yeşil  
Postgîro: 509662-3  
(Sv.Kom.Kvarfonden)

rasizmê çêbû. Di konserê de 11 hezar kron ji bo li Kurdistanê dibistanek bê avakirin hat civandin.



**Rojeva Mehê**

**Li Tirkiya bêserokayeti biserketina xeta milîtarîst**

Çawa berî nuha teqrîben bi sal û nîvekê, dewletê bi dek û dolab û propagandeyên bêbingeh dor li Şernexê girt, riya çûnûhatina nav bajêr derketina sûkê birî û bi çend rojan bajar kavi û wêran kir. Îro jî her bi eynî uslûbî êriş bir ser Licê. Mal û dikan di Licê de nehişt hemû şewitand.

Her çend berdevkên resmî yê dewletê bi beyanekê du beyanan îddîa kirin ku ne dewletê lê PKK'ê ev felaket anîye serê Licîyan jî, lê eşkere ye ku dewleta Tirk bi xwe jî di riya televizyonan re û di riyên din re dixwaze baş bide nişandan, hemû Kurd baş bibînin ku çî bi serê Licê de hatîye û ew dixwazin di binî re xelk bizanibe ku ev yek, jî alî dewletê hatîye kirin. Şernex nimûna yekê bû, Licê jî ya duduyan e ku dewlet dixwaze bi Kurdan bide zanîn heke wekî dewletê nekin dikare çî bê serê wan. Bi bûyera Licê û êrişên dewletê yê van çendên dawîn, hem êdî baş diyar bû ku li Tirkiyê ji bo çareserkirinê çî rê daye ber xwe, hem jî diyar bû ku di dewletê de vê alternatîfê, zora hemû alternatîfên din bir û tik û tenya îro ew tê meşandin.

Xet, xeta milîtarîst e. Milîtarîzmê digot problem jî hebûna PKK'ê dertê, eger em PKK'ê pûç bikin, terorîzm xelas dibe û jî xwe tu problem namînin. Vê xetê, îro gaweke din jî avêtîye. Ne tenê PKK û çekdarên wê, lê hemû kesên ku nan û av û pere didin wê, yê ku meş û mitîng û merasiman dikin, yê ku devê dikanên xwe digrin ew jî hemû terorîst in, terefdarê PKK'ê ne, bi şiddet, bi lêdan, kuştin û wêrankirinê biçin ser wan, divê ew li piştê dewletê bin yan mafê jiyaneke, aram û hêsariya ji bo wan namîne. Milîtarîzmê hefsarê dewletê xistiye destê xwe û li gor wê jî her tişt bi zorê û çavtirsandinê dibe. Divê çavê xelkê bê tirsandin, bi zorê ew bibin aliyê dewletê, dev ji daxwaza mafên azadî û milî û kulturî berdin. Nuha hedefa çekdarên dewletê êdî bûye ew xelkê sivil, ew gund û qezayên ku ne bi dewletên re ne. Li gorî milîtarîzmê ev rewşa han bataxeke ku jiyaneke dide terorîzmê, loma jî divê bê hişkkirin.

Berfirehbûna xebata Kurdewarî ya bêçek a li bajar, qeza û gundan û ya komele, sendîka û rêxistinên siyasî di warê eşkeretiyê de jî tirseke mezin di dilê dewletê de difirîne. Xebata mueseşên weha û berferihbûna wan pirtir îddiyên dewletê yê li ser pîrsa Kurdî û Kurdan bi xwe pûç dike. Heke di hilbijartinên Adara sala bê de DEP piraniya dangan bigre, meşrûtiyeta hebûna dewleta Tirk a li Kurdistanê li ber çavê çîhanê dikeve bin şîkê. Tiştêkî weha jî mirineka rastîn e ji bo dewletê, loma jî bi vê terora berfirehkirî ya li ser xelkê dewlet dixwaze rê li ber pûçbûna vê meşrûtiyê jî bigre.

Biserketina xeta milîtarîst di dewletê de rûdanên van mehên dawîn eşkere dikin ku li Tirkiyê, ne tevgereka sivil a demokrasîxwaz a xurt heye ku wek pêlekê li hember milîtarîzmê rabe û ne jî serokek heye ku xwedanê prensîbên esas, mîrxasekî medenî û jî xwe bawer be ku bê tirs, bê vege xwedî li tevgereka berfireh a ber bi reformkirina Tirkiyê derkeve. Ji generalan, hêzên milîtarîst û tarî netirse û xwe neke rebenekî ber lepên wan. Heta serokekî an serokatîyeke weha mîrxas û xwedan prensîb dernekeve li Tirkiyê nikare gavan ber bi guherînê, xwe-nuhkirinê, çareserkirina pîrsa Kurdî û yê din bavêje. Her wê gelek bê axaftin, lê gava milîtarîstan kulma xwe li masê xist wekî îro hemû wek mişkan xwe tîxin kuneke yan jî tew di ser re hin biçin çepikan ji bo wan lêdin.

**Armanç**  
 Rojnama Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine  
**Redaksiyon:** M. Elî, Hesen Mizgîn, Mirza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, **Redaktorê berpirsiyar:** M. Elî, **Berpirsiyarê beşê Dimilkî:** Malmîsanîj, **Berpirsiyarê rûpelên edebî:** Ehmed Huseynî  
**Utges av:** Kurdîska Demokratîska Arbetarunionen  
**Aboneti/Prenumeration:** Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 200 SKR, Maqam/Myndigheter: 400 SKR, Li Ewropa: 50 DM. Li derveyê Ewropa: 40 \$  
**Anons/ilan:** niv rûpel/en halvsidan 2500 SKR  
**Telefon:** 46-8-803135 **Fax:** 46-8-801825 **Postgiro:** 50 37 99-9  
**Adres:** Box: 152 16  
 161 15 Bromma/Sweden  
**ISSN:** 0348 7385

**Konferanseke navnetewî li ser Zimanê Kurdî**

Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bi hevkarîya Beşa Kurdî ya Zanîngeha Sorbonê di 28 û 29'ê meha 11'an de bi navê "Zimanê Kurdî berbi sala 2000'î" wê li Parîsê, li Unîversîteya Sorbonê konferanseke navnetewî çêbike. Di konferansê de beşdar wê bi taybetî li ser tarîx û evolusyona û tarîxa zimanê Kurdî û zaravayên wî biaxifin. Her weha bisporên hin zimanên din jî wê tecrubeyên wan zimanan jibo çareserkirina problemên zimanê Kurdî wê dîtin û raporên xwe pêşkêşî konferansê bikin. Wekî ku ji programa konferansê jî diyar e zimannas û lînguîstên navdar jî beşdarî vê konferansê dibin. Konferans wê du rojan bajo, programa konferansê weha ye:

Yekşem, 28.11.1993

-Vekirin: **Andre Bourgey** (serokê INALCO: Zanîngeha Netewî ya Ziman û Medeniyeta Rojhelatê ya Unîversîta Sorbonê, Parîs), **Joyce Blau** (Profesorê beşê Kurdî li INALCO), **Kendal Nezan** (serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê).

-Orjîn û tarîxa evolusyona tarîxî ya zimanê Kurdî; serokê rûniştinê **Andre Bourgey**

-Di nav zimanên Îndo-Ewropî de ciyê zimanê Kurdî; **Gilbert Lazard** (Endamê Enstîtuya Fransayê)

-Tarîxa gramera Kurdî; **Pierre Lecoq** (Mudîrê hîndekariya Zanîngeha Pratîk a Xwendina Bilind; EPHE)

-Ji tradîsyona devkî hetta zimanê nivîskî; **Cemal Nebez** (Profesorê zimanê Kurdî li Unîversîteya Berlinê)

-Tecrubeyên standartîzekirina zimanê Kurdî ji sala 1970'yî vir de; serokê rûniştinê: **Philip Kreyenbroek** (Profesorê Zanîngeha Lêkolînên Rojhilatî û Afrîkî-Londra)

-Ji mandatiya Bîranyayê hetta lihevhatina 11'ê Adara 1970'yî; **Îbrahîm Ahmed** (nivîskar û şair)

-Peryoda ji 1970'yî heta 1974'an; **Sami Abdurrahman** (Wezîrê kevî û karûbarê Bakurê Iraqê)

-Rewşa Nuha; X... (Wezîrê Perwerdekarîya Hukûmeta Kurdistanê Iraqê)

-Evolusyona Zimanê Kurdî li Îranê; **Amir Hassan-**

pour (linguist, prof. li Unîversîta Kanadayê)

-Evolusyona Zimanê Kurdî li Tirkiyê û Sûriyê; **Kendal Nezan** (serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê)

-Evolusyona Zimanê Kurdî li Sovyetê; **Ordîxanê Cellî** (Enstîtuya Lêkolînên Rojhelatî-Saint Petersburg)

Duşem, 29. 11. 1993

-Tecrubeyên di standartîzekirina zimanên din de; serokê rûniştinê: **Georges Charachidze** (prof. li INALCO, Parîs)

-Zimanên Kafkasi; **Georges Charachidze**  
 -Tecrubeyên Ewropa Navîn; **Keith Hitchins** (Prof. li Unîversîteya Urbana-Champaign, USA)

-Zimanên Înuîtî (zimanekî Çermserorên Amerîkayê) û Lappî (Zimanê Samên Skandinavyayê); **Michel Therrien** (mamoste li INALCO-Parîs)

-Îbrî (zimanê Yahûdîyan); **Mireille Hadas-Lebel** (prof. li INALCO-Parîs)

-Katalanî; **Miquel Reniu** (Mudîrê beşa Zimanên Siyasî-Barselona)

-Zimanên Tirkî; **Louis Bazin** (Prof/Sorbonne, Parîs)

-Berbi zimanekî Kurdî yê yekbûyî; serokê rûniştinê: **Martin van Bruinessen** (Lêkolînê Enstîtuya Coğrafî û Antropolojî ya Qraliyetê-Hollanda)

-Problem û perspektîvên zaravayên sereke yê n Kurdî:

-Kurmançî; **Reşo Zilan** (linguist)  
 -Soranî; **Kurdistan Mukriyanî** (profesor)  
 -Gotûbêja panelî ya bi beşdarî ya qisekeran.

Her weha civîneke din a li ser zimanê Kurdî dîsa li Parîsê di navbera 27.11 û 4.12.1993'an de wê çêbibe. Ev civîn jî wekî tê zanîn salê du caran jî alî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê tê çêkirin. Civîn tenê li ser pîrsên zaravê Kurmançî radiweste. Piştî her civînekê netîca civîneke di rojnama Kurmançî de tê belav kirin. Li ser navê Armançê jî **M. Lewendî** wê beşdarî vê civîneke û her weha beşdarî konferansa navnetewî ya li ser zimanê Kurdî bibe.

**Nameya Duhokê**

Piştî serîhildana pîroz a sala 1991'ê, ev cara duduyan bû ku ez diçûm Kurdistanê Başûr. Çûyîna min a cara yekê, piştî koça mezin bi demek bû. Tev-lîhevî û bêserûberî hakimê Kurdistanê bû. Ligel wê yekê jî mirov bêhna azadiyê dikêşa nav xwe. Dema ku cara ewil pêşmergan li ciyên kontrolê tirimbêla me dan sekinandin û pîrs kirin, ka em ji kû tînin û bi kû de diçin, ez hissekê welê jiyam ku nayê tarîfkirin.

Ev cara yekem bû ku di jiyaneke de ez li ber nuxta kontrolê netirsîyabûm. Vê carê, dema ku ez ji sînor derbasî Kurdistanê bûm, kontrol jî aliyê dezgehên resmî yê Kurdistanê ve hatin kirin. Li nuxtên kontrolê jî leşkerên Ordîya Kurdistanê û yê asayîşê hebûn. Piştî derbasbûnê min tirimbêlek girt (li vir jî weka her derî li Rojhilata Navîn li ser hidûda zêde peran ji mirov distînin) û ez berbi navnîşana ku hevalekî dabû min, bi rê ketim. Li ser rê hin gund hebûn ku xanî lê dihatin avakirin. Min ev yeka bi vegeandina gundiyan a ser gundên xwe ve şirovekir. Qet nebe vegeêr destpêkiribû. Li ser rê li hin deran lewhên KRO (Rêxistina Avadankirina Kurdistanê) hebûn ku li ser hatibû nivîsandin ku filan gund jî aliyê KRO û CARITAS (Rêxistina Swîsî) ve tînin avakirin.

Carna hin zarok di destên wan de bidoneke biçûk, li ser rê dihatin xuyakirin. Min jî ajovan (şofêr) pîrsî, ka ev çidîkin. Got: "Ev avê difroşin, heke hin rawestînin..."

Piştî min û ajovan me hinek li ser rewşa Kurdistanê sohbet kir. Sohbet pirtir li ser rewşa aborî bû. Di nav re weha got: "Me azadî heye lê gelek ji vî xelkî pîr perîşan in. Dibe ku em carna ji hînan zêde peran distînin, timayî yê dikin, lê carna hin kes hene perê wan nînin em ji wan nastînin, em kesî li ser rê nahêlin. Ku perê te nebin tu jî ne de. Benzîna bûye bi 3 dînanan".

(Ji ber rewşa bêstîqrar bazar pîr zû tê guhertin, piştî wê sohbetê bi 3 rojan benzîna derket 5 dînanan. Carna radibe, carna jî dadikeve.)

Piştî rewîtiya nêzikî seetekê ez gîhaştim Duhokê. Bi riya pîrskirinê min mala mazûvanê xwe peyda kir. Piştî xêrhatinê û vexwarina ava germ me dest bi peyvê kir.

Li gor gotina mazûvanê min ji 8'ê Tebaxê û vir de li devera Behdînan elektrîk qut bûbûn. Kehreba vê deverê jî Musilê dihat û li ser emrê Seddam Husên hatibû qutkirin. Li deverên din ên Kurdistanê kehreba jî Kurdistanê bixwe derdikeve (ji bendava Dûkan). Li gor gotina, dibêjin Seddam gotiye: "Dibêjin hikûmeta me heye, ku welê ye bila hikûmeta wan ji wan re kehrebê bîne".

Nuha hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser çareserkirina vê problemê dixebite. Li gor munaqesha 3 riyên çareserkirina vê problemê hene:

- 1-Ewropa û Emerîka zorê bide Seddam da ku kehrebê berde deverê.
- 2-Girêdana kehreba vê deverê bi

xeta bendava Dûkan ve. (Ji bo vê jî gelek mesref lazim e)

3- Kirîna kehrebê ji Tirkiyê. (Ev jî gelek buha mal dibe.)

Lê belê heta nuha tu çareyek nehatiye dîtin. Li ser zahmetiyên aborî ev yeka jî rewşê hîn xerabtir dike. Yê ku halê wan ê aborî baş e, ji xwe re motorên kehrebê dikirin. Buhayê van navbera 12 hezar û 25 hezar dînarî de tê guhertin. Ji bo ava sar jî heke pere hebin mirov kare bûzê bikire. Qaliba bûzê 20-25 dînar in. Meaşê karmendekî (memurekî) dora 400 dînarî ye. Di vê navberê de jî Yekîtiya Nivîskaran, ji liqa Duhokê nivîskarek bi navê Hesen Nûrî û hevalekî wî hatin mîvaniya mazûvanê min. Û sohbet çû ser nivîsa Kurdî. Li gor gotina wan Wezîrê Kulturî, Şêrko Bêkes emir daye ku bi Kurmançî di kovara Karwan de neyê nivîsandin û nayê nivîsandin. (Li vir qest Kurmançiya bi tîpên Erebî ye.)

Li hember hemû van bêimkaniyetana jî gelê me azadiya xwe bi tu tiştî naguhere. Zarokên Kurdan bi şanazî "uçurtma" xwe difirînin. Bi rastî min bawer nedikir ku di vê rewşa xerab de ezê "uçurtman" li ezmana bibînim.

Lê divê em bizanibin ku sînorê tehamülê jî heye. Azadiya bi zikê birçî, nikare demek pîr dirêj dom bike. Carna mirov kare koletiyê ji azadiyê re tercîh bike.

Hêvî dikim ku em tiştêkî wiha li Kurdistanê nebinin.

**N. Elî**

Dihok 14-9- 1993



Komîta Navendî ya YEKBÛN'ê:

## "Cephe divê bi avakirina xwe re yekser li welêt xwe bi rêxistin bike"

Komîta Navendî ya YEKBÛN'ê (Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistan) di meha Çiriya Pêşin de civiya. Di dawîya civînê de bi beyanekê dîtin û helwesta xwe ya di derheq bûyerên dibin û perspektîfa xwe ji bo bûyerên pêşerojê diyar kir.

Di beyanê de bi dîr û dirêj li ser rewşa Kurdistanê tê sekinandin, sedema teror û cînaletên "qesas nediyar" tê dest nîşankirin, bûyerên berî û piştî teqerawestandinê û bûyera Bîngolê tê tahlîl kirin. Li ser vê prosesê û xebatên li ser cephe beyan weha dibêje:

"Komîteya Navendî politîka û tesbîten Yekbûnê yên di warê teqerawestandin, protkol û pêşveçûnên piştî hingê erê kir û bi bawerîya ku qonaxa diyalog û hevkarîya di navbera hêzên netewî-demokratîk de qat bi qat ji teqerawestandinê girîngtir e. Komîteya Navendî li ser muswedeyên program û destûra cepheyê peyivî û bi çerçewa xwe ya giştî ve herdu belge jî erê kirin û daxwaz kir ku divê cephe bi avakirina xwe re yekser li welêt dest bi rêxistina xwe bike."

Li ser yekîtiya sosyalîstan jî weha dibêje: "Komîteya Navendî di wê baweriyê de ye ku xebata yekîtiya siyasî ya li derveyî Yekbûnê û xebata yekîtiya siyasî ya ku Yekbûn jî tê de ye bigihin hev; li gor meyîl û perspektîfên

aliyên ku xwe sosyalîst dibînin; di serî de RNK/KUK, TSK, Kawa, PRK(Rizgarî), KKP, Têkoşîna Sosyalîst, Ala Rizgarî Tradîsyona Sosyalîst û grubên ku dixwazin li Kurdistanê Bakur partîyeke sosyalîst a bihêz ava bibe, dest bi danûstendinan bikin. Her weha danûstendinên heyî jî di dema herî kin de bigihin encamê û piştî ku xebata yekîtiya siyasî gihişt qonaxekê kes û kadroyên sosyalîst jî bibin beşdarên vê pêvajoyê. Yekbûn di wê baweriyê de ye ku di vî warî de rê nede kirinên ku yekîtiyê bi sedemên cihê dereng bixin, yan bêencam bihêlin."

Li ser partî û kar û barên din yê legal YEKBÛN di beyana xwe de weha dibêje: "Komîteya Navendî tesbît kir ku qonaxa diyalog û hevkarîya di navbera hêzên netewî, demokratîk de, rê vekir ku partîyeke legal a Kurdî wek beşekê têkoşîna netewî demokratîk be avakirin û lewra jî biryar da ku ji bo avakirina partîyeke weha bi hêzên din yê netewî, demokratîk re xebat bê geşkirin. Li gor bawerîya partîya me, di hin politîkayên xwe de xwedî şaşî û kêmasî be jî DEP di riya çaresiyasî û di warê yekîtiya hêzên netewî, demokratîk de gaveke girîng e û eger imkanên wê baş bî bikaranîn, ew dikare di çareserkirina pirsgerêkan de piştigiriyek xurt pêşkêş bike."

## Xebatên avakirina Cepheyê dom dikan

Roja 18-19'ê Çiriya Pêşin 12 hêzên Kurd careke din hatin cem hev, kar û xebatên avakirina Cepha Netewî ya Demokratîk a Kurdistanê domandin. Di dawîya civînê de terefdarên platforma avakirina cephe beyanek çapemenî dan. Di beyanê de ev agahdarî hene:

"Xebatên di navbera hêzên welatparêz yê Kurdistanê Bakur jî bona damezirandina Cepha Netewî ya Demokratîk a Kurdistanê navbera delegasyonan de berdewam e.

Delegasyonên hêzan di navbera 18-19'ê meha 10'an de careka din hatin ba hev û li ser bendên rojava xwe rawestiyar...

Wek berê jî ku ji raya giştî re hatibû diyarkirin xebatên li ser programa cephe hatîye qebûl kirin. Xebatên li ser tiştên din yê ku cephe eleqedar dikan hîn berdewam in.

Em wek terefdarên platforma cephe careke din bawerîya xwe ya girîngiya yekgirtina hêzên welatparêz didin diyarkirin û li hêviya piştigirîya her aliyekî civatê ne ku alîkarîya xwe ji bona damezirandina cepha netewî ya demokratîk bidin diyarkirin."

## Protesto li dijî qetlîaman

Li dijî qetlîamên ku li Kurdistanê çêdibin, li seranserê Ewropa tevdîrên protestoyê çêbûn.

Li gor nûçegîhanê me yê Fransayê Rojen Xerzî, ji bo protestokirina qetlîamên ku li tevayîya Kurdistanê li hember gelê Kurd tê meşandin, li Parîsê jî dervayî PKK, hemû rêxistin û muessesên Kurdan bi navê "Civata Kurd li Parîsê" platformek ava kirin. Platformê di 30.10.93'an de li Parîsê meşek çêkir. Di 26-29/10/93'an de jî li ber avahiya UNESCO'yê grewa birçibûnê çêkir. Her weha beyanek jî belav kirin ku tê de ji Netewên Yekgirtî, Reîsê Cumhur û Wezîrê Derve yê Fransayê daxwaz dikin ku:

-Ji bo rawestandina êrişên Îranê yê bejî û hawayî yê li dijî Kurdistanê helwest bigrin û bibin alîkar ku Îran jî erdên îsgalkirî yê

Kurdistanê federe vekîçe,  
- Ji bo ewlekariya nufûsa Kurda tedbîrên ciddî û bi lez bê stendin,

-Di wextek dirêj de ji bo çareserkirina pirsasî siyasî ya Kurdistanê rê bînin dîtin,

-Wek zivistanê 1991'an, careke din Kurd penaber nebin, acil gav bînin avêtin.

Li Swêdê jî hêzên Kurd yê siyasî û Federasyona Komelên Kurdistanê platformek çêkirin û ji bo protestokirina êrişên Îranê û Tirkîyê yê li ser miletê Kurd, amargoya Iraqê -nemaze ya elektrîkê- li ser Kurdistanê azad û qetlîama dewleta Tirkîyê li Licê, di 26-29/10/93'an de li Stockholmê, rûniştin û mitîng çêkirin. Di 30.10.93'an de berbi Komîseriya Penaberan ya Netewên Yekgirtî meşiyar û daxwaznameyek dan wan.

Di hejmara 142. a Armancê de nivîsek li ser romana M. Uzun, Tu'yê derket. Li ser vê yekê redaksiyonê bi nameyekê dîtinên M. Uzun jê xwest. M. Uzun jî nameya jêrin şand. Hejmara bê emê bersiva Redaksiyonê ya derheqê ve yekê de çap kin.

### Agahîyeke biçûk

Min nama we wergirt. Lê mixabin, ez naxwazim bersiva we bidim. Eger xwediyê nivîsara ku we weşandiyê, navê xwe yê rastî binivîsiya; ziman û uslûba nivîsarê, ne yê sûtalên kuçan, lê mendenbûna we jî li gora ehlaqê navneteweyî yê çapemeniyê bixwesta ew biweşanda, hingê min ê bê guman bi kêfxweşî bersiv bida. Dîtin û baweriyên cihê, munaqe-şe, rexne û pêşniyar pir normal û pir pêwîst in. Lê gava mesele bi-be hesûdî, dijminatî û heqaret, hingê rewş yekcar diguhere û kesên ku bi karê weha kirêt radibe jî divê bizanibe mesûliyeta karê weha çî ne.

Çend kesên li dora Rojnameya we, ji destpêkê heta îro bi îsrar û bi çavsozî dijminatîya min û berhemên min dikin. Nuha jî dîsan ew kes in ku bi karê xwe rabûne û bi zimanê xwe yê nas, hin tişt li ser romana min a yekemîn TU nivîsîne. Tiştên ku meriv bikaribe li ser van kesan bibêje bi hezaran in. Lê ev yek ne karê min e. Kesên ku min nas dikin, dizanin ku deriyê min ji tiştên weha re girîngî û kesên ku li pey teşqe û xirecîrên bêkêr in, divê berê xwe bidin deriyên din. Bê guman e ku ez bi ken li nivîsarên weha dimihêrim û wan bi hêjayê bersiv û bersivdanê nabînim. Kerwan di riya xwe de dere... Xebata min a 20 salan, berhemên min û bi hezaran rûpelên ku min nivîsîne, li holê ne. Bi gotina nivîskarekî Kurdê Sûriyê, ne xem e ku di nav 30 milyon kurdan de çend neyar û dijminên min jî hebin.

Herçî romana TU ye, li serê gotareke min a dirêj ku sala 1987'an de di konferansê de min pêşkêş kiribû û hingê hewceyê çapê nedibû, dê di demeke nêzik de, di nav rûpelên kitaba min a nû "Hêz û Bedewîya Pênûsê" de biweşe. Di wê gotarê de, gelek agahî li ser avakirin, raxistin, şeweyên vegotîne û sebeb û kahniyên romana TU hene. Ez bawer im, ew ê, ne ji bo zikreş, hesûd û neyaran, lê ji bo heval û dostan û kesên ku bixwazin tarîxa nivîsîna romanekê bizanîbin, bi kêr were.

Mehmed UZUN

## Sedsaliya Mîr Celadet Bedirxan

Bi munasebeta sedsaliya Mîr Celadet Alî Bedirxan, di 31.10.93'an de li Stokholmê civînek ji aliyê Yekîtiya Rewşenbîrên Kurdistanê ve hat amadekirin, di civînê de nêzî 100 kes hazir bûn.

Nivîskar Mehmet Uzun li ser jiyana û têkoşîna Mîr Celadet Alî Bedirxan, zimanzan Reşo Zilan û Dr. Celadet Çelîker jî li ser alfabeja Celadet Bedirxan sekinîn û dîtinên xwe anîn zimên.

## NEYNIK

BALKÊŞIYEKE DOSTANE:

### Di vê demê de çima romana Tu?

Îbrahîm Guçlu

Her dezgehek çandî ya Kurd û her rewşenbîrek dixebite ku çanda me ya edetî bêhugartin û bibe çandeke modern û demokratîk. Li bakur qedexekirina ziman û çanda Kurd bûye sedem ku çanda edetî û hevdem ji hevdu veneqetin. Ev awa çand jî li gor xwe rewşenbîr, nivîskar û siyasetvan çêkirîye.

Armanc rojnameyê Kurdî ye û ji bo pêşxistina çanda Kurdî dixebite. Ez ji xebata Armancê kêfxweş im û lewra min xwest ez balkêşiyê xwe bigihînim Armancê.

Di hejmara 142. a Armancê nivîsek li ser romana Mehmet Uzun "TU" derket.

Nivîsara Armancê, li ser romana M. Uzun "TU" yê radiweste û ji diziyên M. Uzun behs dike. Helbet dema ku nivîskarek diziyê bike, nivîskar û rewşenbîrên din jî gerek wê derxin meydanê, rexne bikin û rastiyê diyar bikin. Daku piştê ew nivîskar, careke din wê şaşiyê neke, neheqiyê li nivîskarên din neke û bê izin malê kesên din bir kar nayîne û tiştên nivîskarên din neke malê xwe. Wek pîvan û nêrîn, ez bi xwe ne li dijî vî karî me. Heta ez dibêjim ku em Kurd di vê pîrsê de xwediyên kêmasiyên mezin in û em di van pîrsan de newêrek in jî. Lewra nivîskar, rewşenbîr û siyasetvanên miletekî paşdemayî, her tim ji bo xwe ditirse, xwediyê kêmasiyên mezin e û van kêmasiyên xwe nikare îtîraf bike û ji bo vê yekê jî pêşketina wan jî gelek zehmet dibe.

Wek tê zanîn, M. Uzun romana TU, di destpêka salên 1980'î de nivîsand. Piştî ku pirtûk derket nav raya giştî, li ser vê pirtûkê jî munaqesha dest pê kir: Bi devkî û nivîskî rexne lê hatin girtin, qasî tê bîra min jî, nivîskar û endamê Redaksiyona Armancê Zinarê Xamo, di kovara Berbangê de di yek û du hêjmaran da rexnen xwe nivîsandin. Dîsa di civînên vekirî de, pirtûka TU hate munaqeshekirin. Di wan deman de jî, ji diziya M. Uzun dihat behskirin.

M. Uzun, piştî TU'yê jî hewldaneke baş da, çend pirtûkên din jî çandeya Kurd re pêşkêş kirin. Wek nêrînen edebiyatanên Kurd jî, M. Uzun, li bakurê Kurdistanê wek damezirandina romana Kurdî tehesibandin. Ew ji bo me hemû Kurdan jî, kêfxweşiyek e.

Lêbelê piştî demeke dirêj, ew nivîsara dawiyê ya ku li ser TU'yê hatiye nivîsandin, bi min sivik û ne hewce hat. Heger bê pîrsîn ku çima wisa ye, bersivên min li hemberî vê pîrsê li jêr in.

1- M. Uzun, piştî romana TU çend romanên din nivîsandin. Li ser van romanan, wek li ser romanên TU, tu rexnen ku M. Uzun dizî kiriyê çênebûn. Ew tê maneyê ku piştî romana TU, M. Uzun ji rexnan ders derxistiyê û gora wê jî xebata xwe domandiyê. Dema ku wisa be, gelo pêwîst e ku mirov bê wext dîsa êrişê bibe ser wî?

2- Rexne, pêwîst e ku nivîskarekî an jî siyasetvanekî, pêş bixe. Bi taybetî jî, li bakurê Kurdistanê jî bo ku her tiştêk ji tunebûnê ava dibe, ji bo vê yekê rexnen ku nivîskar û siyasetvanên me pêş bixin, ji her miletekî zêdetir ji bo miletê Kurd hewce ye. Helbet naye wê maneyê ku em rastiyên tehl û tûj jî nebêjin. Rexna Armancê ya dawiyê, di serê min de pîrseke wisa çêdike ku ew ji bo pêşxistinê nîne. Ew Armancê ji ramanên xwe dîr dixê û sivik dike. Ji bo vê jî, dilê min pê diêşe.

3- Dema ku min nivîsara li ser romana TU xwend, min dît ku ew hevalekî nêzik e û gelek eşkere ye ku ji bakurê Kurdistanê ye. Lê Armanc di pêşgotina nivîsarê de, ji bo ku dizane ku karê dike zêde ne di cî de ye, ji bo vê yekê jî sedemên gelek zeîf nîşan dide. Ew bi xwe jî, babetekî xweş nîne. Armanc, ne hewce ye ku ji bo şexsa, bibe wasite.

4- Wek min got, hevalê ku li ser romana TU rexne nivîsandiyê, nas e. Helbet rexnekirin çawa ku mafê herkesî ye, mafê wî hevalî ye jî. Lê tiştê ne rast ew e ku ji bo ku di demeke ne mûsaît de ew rexne nivîsandiyê, pêwîst bû ku navê xwe yê rast binivîsanda. Hezar mixabin, hevalê nivîskar, di vê pîrsê de berpirsiyariya xwe neaniye cîh. Armanc jî, ji bo vê şaşiyê dibe mildar. Ew jî, tiştêkî ne rast e.

5- Ji bo ku rexna li ser romana TU ne bi wext e, ji derveyî daxwaziya Armancê, xwendevanên Armancê, gelek tiştan dikole, dipirse û şik dike. Ez bi xwe dibêjim ku, "M. Uzun demekê ji Armancê re nivîskarî dikir. Piştî demekê, qasî tê bîra min girêdayî kar û barên xwe yê şexsî dev ji nivîsarên xwe berda û Armanc jî bo vê eciz bûye û ji bo vê yekê jî, rexneke bêwext ya li ser romana wî TU çap kiriyê." Gelo wisa ye, an na?



## RAMANÊN RAMANWERAN

## Bêkarî û Çareyek

## Resît Bûrhan

Pirsa bêkariyê ji rûpelên roj-name û kovaran danakeve. Radyo û TV, ji bo wê programên dirêj diweşin. Li universîteyan analîzên li ser bêkariyê tên kirin. Di parlamentoyan de her partî, li gor siyaseta xwe, ji bo çareserkirina bêkariyê li rê û metodan digerin. Tifo, êşa zirav û AIDS çawa ji bo mirovan nexweşiyên mezin in, bêkarî jî wisa ji bo civakê nexweşî ye; nexweşiyêke civakî ye û bi xwe re gelek nexweşiyên sosyal, biyolojîk û psîkolojîk tîne.

Çi dewletên pêşketî bin û çî yê pêşneketî bin, bêkarî hema hema li hemû dewletan heye. Ezê bi taybetî li ser bêkariya welatên pêşketî rawestim.

Li van welatan zêdebûna nifûsê ne pir e û demografiya wî xwedî karekterek stabil e. Welatên pêşketî xwediyên gelek îmkanên aborî, teknîkî û zanistiyê ne. Lê çima bêkarî li wan welatan heye? Û çima nikarin vê nexweşiya sosyal a mezin çareser bikin? Ji bo ku mirov bikaribe bersiva van pirsan bide, divê mirov têkiliyên pêkhatina organîk a kapîtalê di ber çav re derbas ke. Pêkhatina organîk a kapîtalê ji du beşan pêk tê; beşek jê kapîtala guherî: "V" ye, ya din jî kapîtala sabît: "C" e, (berên her du beşên kapîtalê: "W" û yê qezencê: "M").

Kapîtala guherî "V" ji bo meaşên karkeran e. Kapîtala sabît "C" ji bo makîne, lêkolîn, teknîk, xanî, maden, alet û pêwîstiyên ji bo berhemê ye. Pêkhatina organîk a kapîtalê emê wisa nîşan bikin: C:V. Lê pêkhatina organîk a kapîtalê her dem bi hêla "C" yê de tê guherandin. Ji bo guherandina pêkhatina organîk a kapîtalê ew guherandina çawa dibe sedemê ji sedemên bêkariyê, ezê bi minakekê zelal bikim.

Hesen xwediyê bîst milyon kronî ye, dixwaze fabrikeyeke biçûk a şeker damezirîne. Pêşî avahiyek kirê kir, makîne û alet kirin. Ji bo alet û makîna, kirya avahiyê, elektrîk û madenê şeker 10 milyon kron mesref kir. 40 karkir jî girtin ku sala wan jî bi 10 milyona ye. Fabriqa Hesen dest bi berhemdayinê kir. Salê bi W=15 milyona şeker derdixe bazarê, mesrefa wî ya salê C+V=13 milyon e û qezenca wî M=2 milyon e. Piştî pênc salan Hesen dibe xwediyê sî(30) milyonî, lê alet û makînen wî jî kevn bûne, êdî yê avêtinê ne. Lê bazara şeker fire bûye. Hesen bi 20 milyonî makîne û aletên nû dikire. Makînen wî jî bi otomat kar dikin, êdî 40 karkir ji bo fabriqa wî pirr e, 30 karkirî ji bo salekê bi 10

milyonî digre. Di destpêkê de gava ku Hesen dest bi berhemê kir tîkilyên pêkhatina organîk a kapîtal C=V 10:10 (milyon) bû. Lê bi aletên xwe yê nuh bû 20:10, bi vê mînakê em dibînin 10 karkir ji kar hatin avêtin. Û em dibînin çawa guherandina pêkhatina organîk a kapîtalê di hêla kapîtalên sabît de tên guherandin. Bi pêşketina alet û makînan re bêkarî zêdetir dibe, êdî dewsa karkiran robot û kompîtur digrin.

Di pêvajoya berhemdayinê de rola keda mêjî dikeve dewsa keda fizîkî. Ji bo vê yekê êdî zanebûnek fireh û kûr ji karkeran re divê. Cûdabûna di navbera karker û entellektuelan de radibe, yan jî kêmtir dibe. Di berhemdayinê de ji karkirên dest bi nasir bêhtir, karkirên xwenda rolê dilîzin.

Em di demê wusa de ne ku reqabeta di aboriyê de îdialî-

**Çareya kêmkirina bêkariyê, kurtkirina dema kar e. Divê dema kar ne 8 seat be, lê 6 seat be. Bi vê riyê %25 lazimî wê ji karker û xebatkarên re hebe. Ev nîsbeta jî, ji nîsbeta bêkaran bêhtir e.**

ze bûye. Liberalên nû, reqabete wek dermanê her problemên aboriyê dibînin. Şirketên ku nikaribin li welêt û li derve reqabete bikin, li derveyî bazarê dimînin. Ji bo reqabete jî, divê mesrefa xwe kêmtir û qezenca xwe zêde bikin. Ji bo wê jî divê kêmtir karkiran bi kar binin, perê herî hindik bidin karkirên xwe. Li gor îdeologên liberalên nû, şirketên ku hene ger di reqabete de xurttir bin wê bêtir qezencê bikin: û vê qezenca xwe jî wê ji bo berhemên nû bi kar binin û bi vê riyê wê ji karkirên bêkar re kar peyde bibe. Rast e, firma bêhtir qezencê dikin, bêhtir berhemê didin, lê pêkhatina organîk a kapîtalê jî tê guherandin, bêkarî kêmtir nabe, zêdetir dibe. Di 1973'an de li welatên pêşketî %5,4 bêkarî hebû, di 1986'an de ev bûye %8,4 îro li wan welatan bêkarî li ser %10 re ye. Li Finlandiya bêkarî %15 ye, li Îspanya ser %20 î, li Amerika ser %12 ye, li Swêd bêkarî gihast %10. Pêvajok û faktên hene diyar dikin ku teoriyên liberalên nû ji bo bêkariyê qelp derketin û çare ji bêkariyê re neanîn.

Liberalên nû li hemerî sektorên aborî yê dewletê; komuna (belediye) û kooperatîfa şerekî giran û xurt vekirine. Li gorî wan, ev yek ji bo butça dewletê barekî mezin e, loma divê ku bîr firo-

tin. Şexs (kes) wê li sektorên ku qezencê tîne bigerin, mülkiyeta şexsan bêhtir efektîf e, firmayên wan wê bêhtir qezencê bikin û dewletê ji bin barê sektorên xwe xelas bibe. Bi vê riyê inflasyon jî wê ji holê rabe. Aboriya welêt wê xurt bibe û wê ciyê kar jî karkiran re vebe. Bi rastî çiqas sektorên dewletê û komunan kêmtir bû, bêkarî jî zêde bû. Bêguman, politîka aborî ya welatên pêşketî (çi sosyal-demokrat, çi neo-liberal) tu çare ji bêkariyê nedîne. Ku wisa here wê bêkarî pir zêde bibe. Bêkariya îro heye, ji ya dema krîza salên 30'î zêdetir e.

Çareya kêmkirina bêkariyê, kurtkirina dema kar e. Divê dema kar ne 8 seat be, lê 6 seat be. Bi vê riyê %25 lazimî wê ji karker û xebatkarên re hebe. Ev nîsbeta jî, ji nîsbeta bêkaran bêhtir e. Êdî berhem li ser bingeha keda mêjî ye, zanistî û teknîk pir zû pêşde diçe. Aletên di pêvajoka berhemê de ne, di du-sê sala de kevin dibin û dewsa wan aletên nû distîne. Ji bo vê yekê kedkar jî herdem divê zanebûna xwe nû bike û bi pêş bixe. Di wan du seatên ji kar kêmtir bibin de, karker wê zanîna xwe nû bikin û wê bi pêş kevin. Wê bêhtir mal derkeve bazarê û buhayê mal wê hindiktir bibe. Bêyî ku meaşên xebatkarên kêmtir bibe, wê standartên jiyane bilind bibe. Lê belê di destpêka têkoşîna ji bo karê 6 seetan, xwediyên kapîtalê hikumetên welatên pêşketî wê yê yekê qebûl nekin. Em ji bîr nekin ew li dijî têkoşîna ji bo karê 8 seetan jî derketin ku wê demê karkiran rojê 12-14 seetan kar dikirin. Lê dawiyê 8 seat qebûl kirin. Ger bi vî awayî here, nexweşiyên civakê yê wê wêk narkomantî, dizî, kuştin, fihuşî, nijadperestî, alkolistî û hwd. wê zêdetir bibin. Mesrefa ku li derman-kirin û tedbîr standina van nexweşiyên here, ji kêmtir kirina dema kar buhatir e û wê buhatir bibe.

Kurdên ku li Ewropa û li welatên din ên pêşketî ji bêkariyê zirarê dibînin, divê xwedî tawir bin. Dema ku kar dakeve 6 seetan li menfeata xebatkarên Kurd e jî. Ji bo vê yekê divê ku xebatkarên Kurdan ji bo bi destxistina mafê 6 seat kar bixebitin. Ger Kurdên li Ewropa naxwazin li paş demê bimînin, divê ku ew jî li gor demê xwe biguherînin. Zarok, qiz û xortên Kurdan zêdetir bixwînin, ya na li Ewropa Rohilat Kurdên bibin "cîngene". Ji bo me Kurdan çare heye XWENDÎN, XWENDÎN. Û DÎSA XWENDÎN. Çimkî guherandina struktur û karakterên kedê li gor zanistî, teknîk û teknolojîyê ye. □

## Stiriyên me

## Zinarê Xamo

aşîtiya herî xerab  
ji herba herî baş çêtir e

Van êrişên dewletê yê dawî û bi taybetî jî wêrankirina Licê nîşan didin ku serokên dewleta Tirk ji bo çareserkirina mesela Kurd bêyî rîya sîlehê yanî terorê û kuştinê tu rîyeye din nedane ber xwe, di vî warî de programeke wan a aşîtiyê tune. Tiştê ew jî me re wek netewe rewşa dibînin her berdewamiya bindestî û koletiyê ye. Dibêjin hûnê doza tu mafekî netewî û siyasî nekin, wek hêz û wek millet teslîm bibin, "teslîmî milletê Tirk û edelata wî ya mezin bibin". Gava hûn teslîm nebin emê bi zorê we teslîm bigrin. Kesên ku ji bo Kurdan doza mafên netewî û demokratîk dikin gişt "terorîst û qatîl" in. Dema ew dev ji vê doza xwe bernedî emê giştan bikujin. Û dikujin jî. Mesela, Serokê Leşkerî yê Giştî yê Tirkîyê, Dogan Gureş, di beyaneke xwe ya dawî de wê siyaseta dewletê û hukûmetê bi van gotinên jêrîn gelekî vekirî dibêje: "Li ber wan du rê hene: Binêrin ez pirr êşkere dibêjim: Ya wê werin teslîm bibin ya jî giştê bîn kuştin. Wekî din tu rê tune ye".

Bi van gotinên D. Gureş jî em dibînin ku dewleta Tirk, ne terefdarê aşîtiyê ye, terefdarê domandina şer e, ne terefdarê çareserkirineke siyasî û çêkirinê ye, terefdarê şer û xerakirinê ye.

Lê ya herî xerab, ev rîya şer û xwînê, ne ji alî D. Gureş tenê, ji alî piraniya berpirsiyarên dewletê, parlamenter û serokên partiyên ve jî bi xurtî tê parastin. Ew bi vê wahşeta ku îro li Kurdistanê heye qîma xwe naynin, "idareyeke hîn jidyayî" dixwazin. Meclîs, hukûmet û partî ji bo pelçiqandina PKK'ê, xwe davêjin dextlê generalan, dibêjin ancax hûn kanîm me jî wê "belayê" xelas bikin. Û general jî Xwedê heye, qet texsîr nakin.

Lê belê Ecevit tew bi vî şerî jî nayê serî, dixwaze ku ordî "mudaxele" yê Kurdistanê Başûr jî bike. Dibêje heta ku ew rewşa siyasî li wir wiha be em nikanin li vir zora PKK'ê bibin.

Mesûd Yilmaz, Turkeş, Erbakan û yê din jî gişt, kêmtir zêde aligirî "tedbîrên" wiha ne. Çareserkirina meselê tenê di warê eskerî de yanî di zêdekirina terorê û wêrankirina gund û bajaran de dibînin. Û dikin jî. Îro hêzên dewletê li Kurdistanê teroreke nedîtî dimêşin. Her roj bi dehan, belkî jî bi sedan însanan dikujin, gundan dişewitînin, bajaran wêran dikin. Malê millet talan dikin. Li tu derê ne ewlehiya mal û ne jî ya can maye. Di warê ekonomîk û sosyal de rewşa gel bi kêmasî bîst salan bi paşde çûye. Bi milyonan kes ji Kurdistanê koç dikin. Jiyan li gel bûye cehnime. Û wer xu-yaye heger di rojên pêş de pêşketineke pozîtîf çênebe, ev rewş wê hîn jî xerabtir bibe. Çimkî siyaseta ku hukûmetê daye ber xwe û biryarên di van rojên dawî de girtine nîşan dide ku şer wê hîn gurtir bibe.

Bivê nevê meriv ji xwe dipirre:

Gelo ev rewş wê heta ku here? Ev şer wê çuqasî din dom bike, Kurdistan wê çawa ji wê kaosê derkeve?

Helbet gelek çewtî û kirinên PKK'ê hene ku meriv dikane wan rexne bike û divê meriv bike jî. Ji bo siyaseteke hîn gelêrî, hîn netewî û hîn demokratîk rexne û pêşniyarên wiha ji bo partiyekê gelekî muhîm in. Lê guherandina di van waran de nikanin aşîtiyekê bînin Kurdistanê. Çimkî li Kurdistanê rawestandina şer ji PKK'ê bêtir di destê dewleta Tirk de ye. Gava dewlet ji bo çareserkirina meselê gaweke pozîtîf bavêje, dev ji siyaseta xwe ya şovenîst û înkare berde û mafê gelê me yê millî û demokratîk bi rîyeye aşî nas bike, şer wê raweste, xwîn wê êdî hew bê herikandin. Ji ber ku şerê PKK'ê û liberxwedana gelê me ji bo bidesistina vî mafê millî ye. Heta ku dewleta Tirk bi rîyeye siyasî vî mafê me yê millî çareser neke û bixwaze bi darê zorê me tim bindest bihêle, bê guman ne xwîn disekine û ne jî zemîneke diyalogê peyda dibe. Lema jî ji PKK'ê wêdetir divê dewlet dev ji rîya înkare, zorê û şer berde. Gava dewlet vê gavê bavêje bê guman PKK jî û hêzên Kurd yê din jî wê wê gava dewletê bi kêfxweşî qebûl bikin û tiştê dikeve ser milên wan wê bi cîh binin. Û di vî warî de Kurdan daxwazên xwe yê konkret pêşkêşî birûrayagîştî kirine.

Lê wer xuya ye dewleta Tirk îro ne hazir e ku di vî warî de tu gaweke bavêje. Çi Meclîs be û çî jî partî bin, ji dêlî ku bixwazin avekê li vî agirî kin, çareserkirineke siyasî pêşkêş bikin, hêvî û mededê di zêdekirina terorê û di serketineke eskerî de dibînin. Ev jî nîşan dide ku liderên Tirkan tiştê jî tarîxa xwe û ji rewşa dinyayê ya siyasî ya îro fêr nebûne. Heger hinek tecrûbe girtibûna, wê bi rehetî bidîtana ku êdî ne mumkûn e ku kanîbin Kurdan wek berê bindest bihêlin. Heger bi aqilekî selîm bifikiriyana wê jî şerê Yugoslawîyê jî xwe re hîn netîce derxistana. Wê bi hêsanî bizanîbuyana ku ji bo gelên Kurd û Tirk "aşîtiyê herî xerab ji herbeke herî baş jî pir û pir çêtir e". Lê kompleksa mezinayîyê û şovenîzmê çavên wan qarixî kiriyê, du bihistan pêş xwe nabînin; giş bûne gurên dev bi xwîn, bêyî kuştinê qala tu rîyeye din nakin. Ev jî bêşansîyêke miletê Tirk e ku îro kesên wek Demirel, Ecevit, Turkeş, Erbakan, Yilmaz û yê wê wan rêberên wan in. Vana ne ew kes in ku kanîbin bi vê merhela tarîxî ya îro re bimeşin, wê fam bikin û li gor wê gavan bavêjin. Tecrûbe, aqil û cesareta wan a siyasî tîra tiştêkî wiha nake. Lê dîsa jî meriv hêvî dike, hîn ku her du milletan zirarên pir mezin nedîtine û hîn ku bêtir xwîn nerijiyaye maşalê ev rêberên dewleta Tirk li xwe varqilin û dev ji wê siyaseta xwe ya êrişkar û xwînrejê berdin...



Lêkolîn

# Pirsa rastnivîsînê û tewandina navan di Kurdî de

Mûrad Ciwan

Di warê xwendin û nivîsina zimanê Kurdî de, xebat her çendin negihîştîye qonaxêke bilind a li gorî daxwaz û lazimiyên civaka Kurd jî, lê êdî bi dilrehefî em dikarin bibêjin ku zimanê me xwe ji xetera asimîlebûn û nemanê xelas kiriye.

Loma jî em gihastine qonaxêke wisa ku divê êdî em qîma xwe bi her tiştê Kurdî neynin û nebêjin "hema baş e, çimkî bi Kurdî ye", yan jî "bi Kurdî çî bê nivîsîn baş e". Em êdî ji vê qonaxê xelas bûne. Divê em êdî li ser tiştên nivîsandî, bi çavêkî din rawestin, ferqê têxin navbera tiştên rast nivîsandî û yên şaşnivîsandî. Yan yên ziman sivik û şîrîn û yên hişk û giran. Heke ne welê be, zimanê me ji nava têkilhevî û bêserûberiya rêzimanî çî caran xelas nabe, ber bi standardîzebûneke giştî rastnivîsîn û avakirineke giştî ve naçe û rêka zimanekî yekgirtî yê edebî nade ber xwe.

Gava mirov bala xwe bide tiştên ku îro tîn nivîsîn, mirov dibîne ku hem di warê rastnivîsanên peyvan, nêr û mîbûna navan û tewandina wan de, hem di warê rêzimanî yên avabûna cumlan de her tekst bi awakî hatiye nivîsîn. Mirov rastî qaydên giştî yên masdarekê nayê. Xwendevan li hemberî tekstên Kurdî şaş dimînin ka wê guhê xwe bidin qaidên kê.

Îro ez heftê çend seetan memostetîya zimanê Kurdî dikim. Hem şagirdên min ên piçûk hem jî yên emirmezin hene. Divê ez îtraf bikim ku heta niha min tu caran tekstekî Kurdî peyda nekiriye ku bêyî destlêdan ez bikaribim bidim şagirdên xwe da bikaribin bixwînin.

Ya balkêş ew e ku şaşîti û bêserûberiyên rastnivîsînê gelek caran ji alî nivîskarên me yên herî zimanzan û bi tecrûbe jî tînin kirin. Ez dixwazim di vî warî da nimûneyeka herî balkêş bidim. Mesela Mehemed Emîn Bozarşan. Nivîskarekî me yê herî bi nav û deng e ku di warê ziman û edeba Kurdî de xebateke dîr û dirêj û pîralî kirye. Gelek çîrok nivîsîne, berhev kirine, lêkolîn kirine, wergerandine, li ser edeba Kurdî xwêdana xwe rêtiye. Nivîskarekî herî berhevda. Li Tirkîyê cara pêşin jî bo piçûkan Elfaba Kurdî nivîsî ye. Yanî divê mirov wî yek ji wan himdarên zimanê edebî yên nivîskî yê Kurdî bihesibî ne.

Çendekî berê li kutupxaneyê Swêdê ez rastî kitêba wî ya kurteçîroka ya nûçapbûyî ya bi navê "Şerefa Ristem Keya" hat im, min ew deyn kir anî malê, xwend. Min dît ku Seydayê Bozarşan bi îtinayê mezîna pirtûk amade kiriye, xwestîye jî alî rêzimanî, rasnivîsîn û çapkirinê ve, rast be, şaşîti tede tunebin, heta îmkân tede hebe tekûz be. Tevî vê jî gava min ew xwend, jî alî rêzimanî ve hindêk şaşîtiyên fehş tede hebûn ku mirovî bawer nedikir ku ev çîrok dikarin yên Seydayê Bozarşan bin. Mesela min dît ku Seydayê Bozarşan xwestîye di çîrokên xwe de qaidê tewandina navan bikarbîne. Lê di wê karanînê de diyar dibe ku wî hay jî qaidên tewandina navan nîne. Nizane ku di kîjan halan de bi çî awayî nav tînin tewandin. Ji aliyê qaidê tewandina navan heta navê kitêba wî, navên hin çîrokên di kitêbê bi xwe de jî şaş hatine nivîsîn.

Mesela heke mirov guh bide qaidê tewandina navan şaş e ku mirov binivîse "şerefa Rostem Keya" divê mirov yan binivîse "Şerefa Rostem Keya" yan jî "Şerefa Ristem Keyayî".

Navên çîrokên wî jî her bi vî awayî şaş hatine nivîsîn.

<b>Şaş</b>	<b>Rast</b>
Bereketa dikana Mala Şêx	Bereketa Dikana Mala Şêxî

"Kurê Şemo" çawa bû "Ehmed Efendî"	"Kurê Şemoyî" çawa bû "Ehmed Efendî"
------------------------------------	--------------------------------------

"Tirkînezana ne hev-welat in"	"Tirkînezana ne hev-welatî ne"
-------------------------------	--------------------------------

Bihîşt hatiye gund"	"Bihîşt hatiye gundî"
---------------------	-----------------------

Şaşîtiyên tewandina navan bêhed û bêhesab di metnê çîrokên bi xwe de jî hene. Her wekî di çîrokê de wiha hatiye nivîsîn:

"Lê belê wê rojê şansê gundiyan jî şansê qeymeqam jî hebû ku Ehmedê Şemo li gund bû. Dema gund xebera hatina qeymeqam stand, rabû çû berderê mala Şemo û ji Ehmed xwest ku digel wî here pêşiya qeymeqam, paşê jî bi qaymeqam re bi Tirkî bipeyive, di navbera wî û gundiyan da wergêrî bike. Ehmed daxwaza Muxtêr bi kêfxweşî qebûl kir û digel wî çû derê gund, li ser rîya qaymeqam rawesta. Gundi hemî hatibûn wir. Qasek wisa rawestayî man man û çavneriya hatina qaymeqam kirin. Qaymeqam jî dîr ve xuya bû." (Bozarşan, M. Emîn, Şerefa Ristem Keya, 1992 Uppsala, Sweden, r. 11).

Wekî tî zanîn di Kurmancî de nav bi du awayan tînin tewandin. Yek jê awayê tewandina dengdarên peyvê ne ku M. Emîn Bozarşanî jî ew bikar anîye. Ya din jî awayê tewandina bi alîkariya paşpirtikan e ku Botî, Behdîni, Mehmindî û devokên der û dora wan vê usulê bikar tînin.

Li gorî awayê yekemîn, ew metnê jêrîn ê çîrokê divê bi vî awayî bê nivîsîn: "Lê belê wê rojê şansê gundiyan jî, şansê qeymeqam jî hebû ku Ehmedê Şemo li gund bû. Dema muxtarê gund xebera hatina qaymeqam stand, rabû çû ber derê mala Şemo û ji Ehmed xwest ku digel wî here pêşiya qaymeqam, paşê jî bi qaymeqam ra bi Tirkî bipeyive, di navbera wî û gundiyan da wergêrî bike. Ehmed daxwaza Muxtêr bi kêfxweşî qebûl kir û digel wî çû derê gund, li ser rîya qaymeqam rawesta. Gundi hemî hatibûn wirê. Qasek wisa rawestayî man man û çavneriya qaymeqam kirin. Qaymeqam jî dîr ve xuya bû."

Li gorî awayê duwemîn jî navên di vî metnê de divê bi vî awayî bê nivîsîn: "Lê belê wê rojê şansê gundiyan jî, şansê qaymeqam jî hebû ku Ehmedê Şemoyî li gundî bû. Dema muxtarê gundî xebera hatina qaymeqamî stand, rabû çû ber derê mala Şemoyî û ji Ehmedî xwest ku digel wî here pêşiya qaymeqamî, paşê jî bi qaymeqamî re bi Tirkî bipeyive di navbera wî û gundiyan da wergêrî bike. Ehmedî daxwaza Muxtari bi kêfxweşî qebûl kir û digel wî çû derê gundî, li ser rîya qaymeqamî rawesta. Gundi hemî hatibûn wirê. Qasek wisa rawestayî man man û çavneriya hatina qaymeqamî kirin. Qaymeqam jî dîr ve xuya bû."

Cumleyeka din jî çîroka Bozarşanê: "Kî çî bêje hema ew xwe davêje pêş û henekek dike her kesî dikenîne, her tiştî diherimîne, tam di tişteke da nahêle. n. d. r. 2-5"

Lê rasttewandina navên vê cumlê divê bi vî awayî bin: "Kî çî bêje hema ew xwe davêje pêş û henekekê dike, her kesî dikenîne, her tiştî diherimîne, tamê di tişteki

da nahêle."

Di warê tewandina navan da şaşîtiya gelemperî ew e ku, li ciyê ku nav divê bê tewandin nayê tewandin. Ew jî gava navê mî be tî tewandin. Lê yê nêr be netewandî tî hiştin. Helbet ev şaşîti jî ber wê yekê ye ku, di devokên me yên der û dora Diyarbekirê de, bi giranî tewandina navên nêr rabûye.

Lê gava hin nivîskarên me, hay jî tewandina nava dibin û dixwazin, halê tewandî jî di metnên xwe de bikar binin, jî ber ku nizanin tewandina navan di kîjan halan da bi çî awayî pêk tînin, li cihên ku divê nav neyên tewandin jî ew navan ditewînin. Seydayê Bozarşan jî yek ji wan nivîskarên e ku gelek caran navan di cihê şaş de ditewîne. Mîsal: "Paşê qaymeqam Ehmed da teniştê xwe û berê xwe da mala Muxtêr. Muxtêr jî li aliyê wî yê dî dimeşiya. Lê belê qaymeqam guh nedida wî, her bi Ehmed ra dipeyivî. (n. d. r. 13): Di vir de divê "muxtari" nehata tewandin. Rastiya tekstî bi vî awayî ye:

"Paşê qaymeqam Ehmed da teniştê xwe û berê xwe da mala Muxtêr. Muxtari jî li aliyê wî yê dî dimeşiya. Lê belê qaymeqam guh nedida wî, (ew) her bi Ehmed ra dipeyivî."

Yan jî divê bi vî awayî bê nivîsîn: "Paşê qaymeqamî Ehmed da teniştê xwe û berê xwe da mala Muxtari. Muxtari jî li aliyê wî yê dî dimeşiya. Lê belê qaymeqamî guh nedida wî, (ew) her bi Ehmedî ra dipeyivî."

Li ser şaş tewandin an netewandina navan, mirov dikare nûmunan, jî hemû nivîskarên û hema hema ji hemû tekstan bîne. Ne ku Seydayê Bozarşan take-numûne ye. Belkî jî ew esas bi rêkûpêktirîne hemûyan e jî. Piçêkî jî ji ber vê yekê min nimûne ji çîrokên wî anîn. Min xwest ez nîşandim ku yê herî hostayê me wiha be, xwedê zane em yên din çawa ne.

Loma jî li vê derê piçêkî dixwazim li ser mesela tewandina navan rawestim. Nav, kengî bi çî awayî ditewin?

Her wekî tî zanîn, di Kurdî de du halên navan hene, halê xweser û halê tewandî. Navên mî bi alîkariya paşpirtika (-ê) tînin tewandin.

Mîsal jî bo navên mî:

<b>halê xweser</b>	<b>halê tewandî</b>
xwişk	xwişkê
jin	jinê
mîh	mîhê
def	defê
Zeyneb	Zeynebê
dar	darê

Navên nêr jî bi du awayan tînin tewandin. Yek jê ew awa ye ku li Botan, Behdînan û Hekariya tî bikaranîn ku ew jî bi vî awayî ye: Paşpirtika (-î) tî paşîya navê nêr û bi vî awayî navê nêr tî tewandin. Mîsal:

<b>halê xweser</b>	<b>halê tewandî</b>
Ehmed	Ehmedî
Şemo	Şemoyî
muxtari	muxtari
qaymeqam	qaymeqamî
hesp	hespî
gund	gundî
beran	beranî

Di şeweya Dimilkî (Zazakî, Kirdkî) de jî navên nêr bi vî awayî tînin tewandin.

Awayê tewandina navên nêr yê din jî ew e ku pirê caran di devokên me yên Kurmancî yên navîn de wenda bûye, lê bi xurtîya xwe di herêmên me yên rojava de mane. Tewandina bi vî awayî di hemû navên nêr de bikar nayê. Tenê gava di vî navî de dengdarên "e" yan "a" hebin, dengdara dawîn a "e" yan jî "a" radibe di şûna wê de dengdara "ê" bikar tî û bi vî awayî tî tewandin. Mîsal:

<b>halê xweser</b>	<b>halê tewandî</b>
Ehmed	Ehmed yan jî bi istisnayî Êhmed
Şemo	Şemo
muxtari	muxtêr
qaymeqam	qaymeqem
hesp	hêsp
gund.....	çimkî dengdarê "a" yan jî "e" tede nîne, loma jî wekî xwe dimîne.
beran	berên

Baş e gelo nav kengî, li ku tînin tewandin?  
a) Di tarîfkariya navan de (ku bi Tirkî jê re "isim tamamlaması" tî gotin) her tim navê ku tarîf dike tewandî ye. Mîsal:

<b>1</b>	<b>2</b>
mala Muxtêr	mala Muxtari
Ehmedê Şemo	Ehmedê Şemoyî
şîrê bizinê	şîrê bizinê
goştê berên	goştê beranî
çîroka Bozarşan	çîroka Bozarşanî

b) Gava nav bi edatên (bi, li, ji, di...de, di...ve, di...re, ji...re, ji...de, bi...re, bi...de) re hatin bikaranîn her tim tewandî ne. Mîsal:

<b>xweser</b>	<b>tewandî(1)</b>	<b>tewandî (2)</b>
muxtari	ji Muxtêr	ji Muxtari
hesp	li hêsp	li hespî
gund	di gund de	di gundî de
qaymeqam	bi qaymeqem re	bi qaymeqamî re

c) Tewandina navan, di nav cumlê de jî bi vî awayî tî bikaranîn:

1) Gava fiêla (karê) cumlê intransîtîf (netêper bar) be, di hemî zemanan de navê ku subjekt e (yanî binde ye) di halê xweseriyê de ye. Di cumlê de objekt (yanî bireser)...  
Mîsal: Di cumla "muxtari jî li aliyê wî yê dî dimeşiya" de, "meşîyan" kareka netêperbar ( intransîtîf ) e, loma jî di hemû zemanan da divê subjekt ( yanî muxtari ) xweser be, nayê tewandin.

Muxtari jî li aliyê wî yê dî dimeşiya. (Dema Borî)  
Muxtari jî de li aliyê wî yê dî bimeşe. (dema Mayî)  
Muxtari jî li aliyê wî yê dî dimeşe. (Dema Niha)

2) Gava fiêla (Karê) cumlê transîtîf (têperbar) be;  
a) Di dema niha, ya fireh û ya mayî de navê ku subjekt e xweser û yê ku objekt e tewandî ye.

Qaymeqam de hespî bajo.  
Qaymeqam hespî dajo.  
Şivan pêz (pezî) diçêrine.  
Ehmed dersê dixwîne.  
Muxtari Ehmedî/Ehmedî dibîne

b) Di hemû demên borî da, subjekt (kirde) tewandî ye, objekt (bireser) xweser e. Mîsal:

Qaymeqam/ qaymeqamî hesp ajot.  
Qaymeqem/qaymeqamî hesp ajotibûya.  
Şivanî/Şivên pez çêrand.  
Ehmedî/Êhmed ders xwendibû.  
Muxtêr/muxtari Ehmed dit.



# Osman Sebrî jî ji nav me barkir

Sibe an dusibe, piştî çendakî,  
Teqez dê bimirim bi xweşî û çakî.  
Heye bêm kuştin bi çî awayî  
Bê şik ji bo min ev yeka şayî.  
Ji bo çûna min hêvî ji yaran  
Ew nexeyidin zîhar tu caran.  
Cendek dimire lê can dimîne,  
Bo tiştên herhe tunebûn nîne.  
Mirin vejîn e li cihekê din  
Ew cih şîrîn e, dîyar e ji min.

Osman Sebrî

Di 11.10.1993'an de, şair û têkoşerê Kurd Osman Sebrî li Şamê li taxa Kurda li mala xwe di 88 salîya xwe de wefat kir. Di 13.10.1993'an de cenazê wî anîn Qamişliyê di wir re jî birin li gundê Berkevîrê nêzî Dirbesiyê veşartin.

### Em jî çûn seredana wî

Osman Sebrî di nav Kurdan de bi navê Apo dihat naskirin. Heta roja mirina xwe jî, hemû Kurd ji herderên Kurdistanê û ji derveyî welat ger rîya wan bi Şamê keta miheqqeq diçûn seredana Apo Osman.

Di 27.05.1993'an de ez û ji redaksiyona Armancê **Mirza Bextiyar û Dilawerê Zengî** em jî çûn seredana wî. Min berê qet ew nedibû. Min ew di rîsman de û ji nivîsên wî nas dikir. Lê li



Di 27.05.93'an de du endamên redaksiyona Armancê M. Bextiyar û M. Lewendî li mala Osman Sebrî bûn.

gor wan rismên ku min dibûn, pûrtir bûbû û ketibû nava nivînan. Deng nedigirt. Destê wî êdî qelam nedigirt. Her wê rojê kitêba xwe ya "Çar Leheng" diyarî me kir, lê ji ber lertzîna destên xwe nikaribû ji me re îmze bikira. Li

şûna wî xwarziya wî **Kewê** li ser navê wî ji me re îmze kir. Kewê di mala Osman Sebrî de mezin bûye. Û heta roja mirina wî jî her di xizmeta wî de bû.

Berî ku em herin mala wî, gelek kesî digotin ku Apo Osman

êdî hiş wenda kirîye. Lê bi me qet jî welê nehat. Hişê wî li serê wî bû. Lê destên wî dilerizîn û guhê wî giran bûbûn.

Me derheqê dewra Hawar û Ronahiyê û malbata Bedirxanî û Cemil Paşayan de hin pirs jê ki-

rin. Lê xuya bû nedixwest biaxive. Digot "dev jê berdîn, hema baştir e ku ez qala wê dewrê nekim, lê Celadet zimanzanekî baş bû". Xuya bû ku ji kirinên hin kesên wê demê ne razî bû. Ji ber nexweşî û bêhaliya wî me jî êdî zor nedayê. Me çay û qahwe vexwar.

Apo Sebrî her cixare jî îkramî me dikir. Em piçekî li mala wî geryan, diwarên odeyên mala wî ji derveyî çend rismên malbatî, hemû bi rismê Kurdan ve xemilandi bû. Ji rismê Dr. Şivan, Seid Elçî, danderên Xoybûnê û hin gelekên din bigrin heta bi yê **Abdullah Ocalan**. Paşe me xatir ji wî û ji xwarziya wî Kewê xwest û em derketin.

Piştê li derve me di nav xwe de xeberda û me got "bi rastî heke cennet hebe divê ku xwarziya Osman Sebrî, Kewê cennetî be. Xizmeta ku wê ji Osman Sebrî re kirîye belkî tu kesî nekirîye. Jixwe Osman Sebrî jî gotîye "her çendî mal û milkê min tuneye lê çî kitêb û berhemên min ên nivîskî hebin ez hemûyan jî Kewê re dihêlim".

### Bi kurtî jiyana Osman Sebrî

Osman Sebrî di 1905'an de li hêla Adiyeman (Semûr)ê li Kurdistanê Tirkîyê ji dayik bûye. Ew ji eşîra **Mirdêsîyan** in. Navê bavê wî Sebrî ye. Bavê wî serokê eşîra Mirdêsîya bû ku di 1915'an de mir. Osman Sebrî di 1922'an de Ruştîye (Ortoqil) xelas kirîye. Di serhildana Şêx Seidê Pîranê de du apên wî; Şukrî û Nûrî ku ew jî ji serokên Mirdêsîya bûn, li Dîyarbekirê tîn îdamkirin. Osman Sebrî di 1928'an de li Denizliyê demekê di girtîgehê de dimîne. Di 1929'an de li Meletiyê wî didin Dîwan-î Herbê.

Piştê re fersend dikeve destê wî ew di 24.11.1929'an de direve diçe Kurdistanê Sûriyê, dikeve nav refên Xoybûnê. Di 1930'yî de bi biryara Xoybûnê vedigere Kurdistanê Tirkîyê. Piştî ku şerê Agriyê bi semakeve dîsa vedigere Sûriyê.

Li Sûriyê di salên 30-40'yî de li gel **Celadet Bedirxan** û ronakbîrên din ên Kurdan di xebata kovarên **Ronahî û Hawarê** de cih digre.


Osman Sebrî herçendî bi şairîya xwe tê naskirin lê her weha wî çîrokên tarîxî, serpehatî û nivîsên li ser adetên Kurdan, li ser Yezidîyan û gelek babetên din jî nivîsîne.

Piştî rawestana kovarên Hawar û Ronahî û Roja Nû'yê û jihevketina Xoybûnê, ronakbîrên Kurd êdî pir ne li ser hev in. Heta hin ji wan bi hev dikevin. Bi taybetî jî di vî warî de herkes qala **Qedri Can** û Osman Sebrî dikin ku gelekî dijminatîya hev kirine. Lê gava ku mirov li nivîs û helbestên wan ên di Hawar, Ronahî û Roja Nû de derketine dinihêre, çî Osman Sebrî be, çî Qedri Can be û çî jî Cegerxwîn be her li ser hev methîye nivîsîne, bi helbestkî anjî nivîskî pesnê hev dane.

Lê piştî salên 1950'yî û bi taybetî piştî mirina Celadet Bedirxan, xuya ye ji alî siyasî de li hev nekirine û bi hev ketine. Gava ku em li Sûriyê bûn, li ser vî yekê me ji gelek kesên ku Osman Sebrî û Qedri Can nas dikirin pirsî. Bersiva piraniya weha bû:

## Azadî ji bo welatperwerên Kurd ên di girtîgehên Şamê de

Ev serê salekê ye ku 21 welatperwerên Kurd di girtîgehên Şamê (Saydnaya, Adra, Firi Felestîn) de, bê îfade û mahkeme girtî ne. Peywendî yên bi her awayî yên bi girtîyan re qedexe ye. Em li vir vî kirina Sûriyê protesto dikin û ban hemû dem û dezgahên însanî û huqûqî dikin daku piştigirîya welatperwerên Kurden di zîndanên Şamê de ne, bikin. **Armanc**



Girtîgeha Saydnaya: 1-Mûsa Hisên Elî 2-Ebdulbaqî Sinan 3-Şerîf Şukrî 4-Omer Elî Emo 5-Hisên Kaso 6-Mihemmed Sedîq Şêxî 7-Selman Şêxmûs Mihemmed 8-Bêşir Mihemmed Şêxmûs 9-Şêxmûs Ebdulqadir Girtîgeha Adra: 10-Ebdulbaqî Yûsif Salih 11-Silêman Oso 12-Mihemmed Beşîr Mele Ehmed 13-Welîd Husên Ebdulqadir 14-Yûnis Hesen Hemê 15-Dara Heso Nayif 16-Zekî Hecî Muhemmed 17-Muhemmed Yûsif Hesen 18-Ehmed İbrahîm Muhemmed 19-Şerîf Osê Girtîgeha Firi Felestîn: 20-Ferîd Xefîl Osman 21-Omer Dawud



"Osman Sebrî mêr bû, tu carî xwe li ber kesî xwar nedikir. Lê pîr esebî bû."

Ji bo Qedri Can jî weha digotin:

"Ew jî mêr bû, bi desthilanîn bû. Bi rik bû. Meseleyek biçûk mezin dikir... Pîr li xwe mêze dikir. Bi kesên ronakbîr û dewlemend û eşrafan re radibû û rûdinişt." (ji destnivîsa hevpeyivîn û suhbetên me yên bi Kurdên Şamê re. 28.4.1993-17.6.1993)

Derheqê vê meselê de me jî Osman Sebrî jî pîrsî, lê wî tu bersîveke têr neda me tenê "dev ji yên çûyî berdin, li yên nuha binêrin" pişt re jî "apo gi' emil (ajan/ cahş) ê Fransîyan bûn" got.

Piştî salên 1950'yî Osman Sebrî û gelek Kurdên din jî bo avakirina partiyekê dixebitin. Û di 1957'an de Partiya Demokrata Kurdistanê Sûriyê ava dikin. Di 1965-1969'an de dibe sekreterê giştî yê partiyê. Pişt re dîsa jî ber teşqeleyn sîyasî yên nav kesan jî partiyê vediqete. Lê wek Kurdekî serbixwe heta roja mirina xwe dîsa her karê Kurdîyê û yên li ser ziman û edebê berdevar dîke. Heta nuha pênc kitêbên wî derketine. Le di kovar û rojnameyên Kurdan de gelek gotarên wî bi xwe an jî hevpeyivînan bi wî re derketine.

Di nivîs û helbestên xwe de wî jî bilî navê xwe, her weha naznavên Apo û Labût jî bi kar anîye.

Osman Sebrî du caran zewicî bû, jina wî ya pêşî Kurd ya du-duyan jî Çerkez bû. Ji jina wî ya Kurd kurekî wî bi navê Welato hebû ku ew jî di salên 1970'yî de li Kurdistanê Tirkîyê hat kuştin. Ji jina wî ya Çerkez jî pênc zarokên wî hene: Hoşeng, Hoşîn, Heval, Hungur û Hêvî.

### Berhemên Osman Sebrî

- 1-Apo, "gotinên xav nepijîn bê tav", Almanya, 1981, (Hemreş Reşo amadekirîye û çap kirîye .
- 2-Çar Leheng, 1984, 40r.
- 3-Bahoz û çend nivisarên din, 1956, Şam(?), 68 r.
- 4-Derdên me (gotar û helbest)
- 5-Elifbêya Tikûz, 1982, (?)
- 6-Elifbeya Kurdî, Şam, 1955, 56r.

Ji ber dirêjîya nivîsê me bibliyografya nivîsên wî hişt bo hejmarek din. Lê dîsa jî ji bo kesên ku bixwazin li ser nivîs û helbestên Osman Sebrî lêkolînekê bikin, piraniya berhemên wî di van kovar û rojnameyan de derketine: Hawar (1932), Ronahî (1943), Roja Nû (1943), Hêviya Welêt (Awrûpa, 1963), Çiya (Awrûpa, 1966), Hêvî (Paris, 1983), Berbang (Swêd, 1983), Roja Nû (Swêd, 1983).

#### Çavkanî:

- 1-Apo, "gotinên xav nepijîn bê tav", Almanya, 1981 (ji pêşgotina H. Reşo).
- 2-Osman Sebrî'yi Yitirdik, (ji belavoka Havgirtin-PDK, 12. 10. 1993)
- 3-Osman Sebrî; Çar Leheng, 1984
- 4-"Osman Sebrî Bo Pêşengê Dipeyive", Pêşeng (kovar), no: 5 (Nîsan 1984), r. 43
- 5-Hemreş Reşo, Çiya (Kovara Çanda Kurde), no: 1-8 (1965-1970), Almanya.
- 6-Amed û Zîn; Welatparêzê hêja Apo (Osman Sebrî) wiha dipeyive. Hevpeyivînan salên 1984-1988, Paris, 1991

### Mahmûd Lewendî

Ferîde xanim jina Nûrî Dêrsimî wefat kir

# Suhbetek bi Ferîde xanimê re

## Mahmûd Lewendî

Di 3.6.1993 û 5.6.1993'an de li Helebê em çûn seredana wê. Nexweş bû, digot "destê min ê rastê ditevize, felc bûye". Me xwest em pê re hevpeyivînekê bikin, lê ji ber bêtaqetiyê nikaribû. Êdî di nav wan du rojan da wê çî got me jî nivîsand. Li jêr em kurtiya wê suhbeta xwe ya bi Ferîde xanimê re pêşkêşî xwendevanan dikin.

Di 3.6.1993'an de ez, Ahmedê Wêranşarî, Reşatê Dêrikî, Gurgînê kurê Hesên Hîşyar, Azadê bûrayê Gurgîn û Mîrze Bextiyar çûn Helebê mala Nûrî Dêrsimî.

Jina Nûrî Dêrsimî Ferîde û dişa wî û neviya wî li mal bûn. Em rûniştin. Cejin bû. Ji me re qahwe û şekirê cejnê anîn. Paşê Şêx Alî jî hat. Ferîde xanimê kasete Nûrî Dêrsimî bi me da guhdarî kirin. Nûrî Dêrsimî tê de Xîtabeta xwe ya meşhûr a jî xortan re dixwend û nameyek jî jina xwe Ferîdeyê re û nameyek jî kovara Barîş Dunyasî'yê re. Saetekê bêdeng me guhdarîya kasetê kir. Wekî ku Nûrî Dêrsimî jî di nav me de be. Ji teybê dengê wî dihat û li dîwaran jî rismên wî daliqandibûn. Me bi nihêrtina li rîsman re guhdarîya dengê wî dikir. Girûzî diket canê me. Carna mirov kelogirî dibû. Carna jî pêlên mîrxasiyê dihatin û carna jî heyfa mirovî pê dihat ku mirovên weha, zû ji nav me barkirin û çûn.

Me xwe bi wê da naskirin. Suhbeta me geh bi Tirkî, geh bi Kurdî û geh bi Erebi bû. Ji ber ku Ferîde xanim piçekî nerehet bû, me ji bo suhbetê rojek din tesbît kir.

Nûrî Dêrsimî di 1893'an de ji dayik bûye. Di 1973'an de wefat kirîye. Deh sal berî mirina xwe gora xwe çêkirine. Û herdu bi hev re çûne ser gorrên xwe û rîsmek jî kişandine.

5.6.1993 Îro rewşa Ferîde Xanimê piçekî baş e.

Li ser mirina N. Dêrsimî, Ferîde Xanimê weha digot: Nivro bû, me firavîna xwe xwar. Nûrî Beg rabû çû serşokê ku destê xwe bişo. Ban min kir, got: *wekî ku serê min ji germa dişewite, hundurê serê min germ bû, madê min digere.* Li hundir mîvanekî me jî hebû; Ebû İzzet, min ban kirê, heta hat Nûrî Beg ji dest min ket erdê, bêdeng ma. Ebû İzzet hat û nihêrt û wî fam kiribû ku miriye, lê ji min re negot, got: *ezê ban lawê xalê te bikim bila bê , û çû.* Paşê min ban cîranê me kir. Cîranê me got *serê te sax be.* Min fam kir ku êdî çûye. Ez li ciyê xwe mat mam. Hema welê bi carekê de, Nûrîyê minê sipîsaxlem ji nav me barkir û çû.....

Nexweşiya wî ya dil hebû, lê her tim bi rêk û pêk derman dixwar.


Sîbeha roja ku wefat kir, şiyar bû û got: *Ferîde min îşev xewnek*



M. Bextiyar Ferîde Xanim û M. Lewendî (Foto: Armanç)



Nûrî Dêrsimî û Ferîde Xanim li ser gorrên xwe rûniştine. N. Dêrsimî deh sal berî mirina xwe gorra xwe û ya jina xwe daye çêkirin (Foto: Ji Ferîde Xanimê)



Gorra Ferîde xanim û Nûrî Dêrsimî (Foto: Armanç)

Nivîsa li ser lewheya li jor kêla Nûrî Dêrsimî:

Dilbirin û bi nalîna welat

Muhammed Nûrî Dêrsimî ibn el- Mola İbrahim Colikoxlî

Li ser vê rîya dejwar

Min jî kire pîr hewar

Da ji bo we jî rojekê

Dunya bibe gul nihar

Welid fi Kurdistan Turkiya Mart 1893

Teweffî Heleb 22 Ab 1973

Nivîsa li ser lewheya li jor kêla Ferîde Dêrsimî

Dilgirtî

Ferîde Dêrsimî binit Eli Xazêoxlî

dît. Ez çûbûm Koçgirîyê, min zeviyên xwe çand. Nobedar jî li ber zeviyan bûn, lê du gayên reş hatin hemû zevi xerab kirin.

Wê rojê li ser vê xewnê ditirsiya ku bi tenê bimîne. Ji ber ku

ez mamoste bûm, min got tişt nabe, metirse, ezê îro li malê li cem te bim, ez naçim mektebê.

Van her du salên dawî li tembûrê dixist û ji xwe re distira û pê re jî digirya.

## Ferîde Xanim

Ferîde Xanim di 9.9. 1993'an de li Helebê mir. Di 10.9.1993'an de bi beşdariya gelek Kurdên Sûriyê û partî û rêxistinên Kurdan ew li goristana Şehîd Hennan nêzî Afirînê li cem Nûrî Dêrsimî veşartin.

Ferîde xanim di 1920'an de li Helebê ji dayik bûye. Navê bavê wê Elîyê Xazê ye. Ew bi xwe jî Dêrsimî ji eşîra Şemikan in. Ferîde xanim bi xwe mamoste bû. Wê demeke dirêj mudurî jî kirîye. Di 1939'an de bi Nûrî Dêrsimî re zewicîye. Bi Tirkî û Erebi û piçekî jî Kurdî zanibû.

Wextekê xalê wî û pîsmamê wî û xuşka wî di Adara 1949'an de hatin Helebê seredana wî. Bi hatina wan pîr kêfxweş bû.

Piştî 1950'yî zarokên birayên wî hatin vê derê.

Mirovekî esebî bû. Lê piştî ku min ew baş nas kir min hereketekê ku wî esebî bike nedikir. Min tim diqqet dikir.

Ew bi xwe di 1937'an de hat Sûriyê. Di 1939'an de li Helebê em zewicîn. Pêşî wî û apê min Rîza hevûdu nas kirine. Bi wasita wî me jî hevûdu naskir. Teqriben 30 salî ji min mezintir bû. Lê carê kiribû serê xwe ku wê min bixwaze. Wexta ku xwest, malbata me piçekî ketin şubhê, dibe ku zewicî be. Bavê min da pê û li ser gerya, xeber şand Dêrsimî. Ji Dêrsimî xeber hat gotin: *Jina wî hebû, navê wê jî Selvî bû, lê di şer de hatiye kuştin.*

Bi tesîra xuşka min a mezin ez qanî' kirim. Em bûn destgirtiyên hev. Me nişana xwe çêkir, paşê ew çû Emman (Urdu) ê. Piştî demekê ez û du jinikên mirovên me em jî çûn Emman seredana wî. Li wir me mahra xwe ya resmî, (sala 1939), birrî. Du salan li Emmanê ma. Salekê li Hemma ye ma. Û pişt re jî êdî her li Helebê ma.

Li Dêrika mintîqa Cizîrê jî xwe re erdek kirî. Paşê hukmatê wekî ku dest danîn ser erdên hemû Kurdan, dest danîn ser erdên me jî. Paşê di 1979'an de 120 hektar ji wî erdê me li me vegeandin, yên mayî jî wekî yên Kurdên din dan eraban.

Di 1966'an de dev ji kar berda. Cixare venedixwar. Eraq kêmb vedixwar. Hevalên wî yên herî nêz mala Cemîl Paşa, Bedirxanî û Memduh Selîm bûn.

Ez bi xwe ji hêla Dêrsimî me. Navê bavê min Elîyê Xazê ye. Bavê min li vê derê zewicî. Em ji eşîra Şemikan in. Ji malbata me re jî Zarokên Xazê dibêjin. Xazê pîrika min e. Ez di 1920'an de li Helebê ji dayik bûme.


Di mirina Nûrî Beg de Kamûran Bedirxan û Nureddîn Zaza jî qerên sersaxiyê şandin.



## Çand û wêje

## Vê rastiyê rawestînin!

S. Berekat



✓ "Ez Kurdiya lêvkî dizanim, lê a niviskî ji bo me qedexe bû. Her weha qedexe bû -ji- ku em bêjin 'em Kurd in'. Dêmek êrîşa wan li ser nasnameyê bû ne ku li ser zimên bû, çumkû mirov dikare bi lalî zimanê xwe bikarîne."

✓ "Ez Kurd im. Erê. Ez dikarim bi hezar zimanî giyanê xwe derbibirim. Lê, dema ku zimanek ji wan zimanên Kurdîtiya min gem bike, wê gavê 'sirgungêh' çî li vir û çî li wir, -di wê dojeha ku rejîm ji xwe re dike 'qanûn' ta ku ji hevcihêbûnan ji holê rake-, dest pê dike."

## Selim Berekat

Selim Berekat Kurdekî Erebinivîs e, lê dema ku giyanê xwe amade dike daku çewtîyên ve jiyana bêdad û dilreq û nakokiyên ve çihana serberdayî, bi alavên xwe yê efsanewî û ekzotîk û bi şiyana bêhempa ya peyv û afrandina ku di hebûna wî de -wek dahêner- mîna sawek bêcir, her û her diwartir û tîrtir dibin, serast bike. Wê demê, ne bizava giyan li beramber derbirina rastîna ya azar û eşan radest dibe û ne ji derbirin xwe ji ber pêlên coşane ên kuşdar û tirajediya Kurdên ve serdema bêrûmet dide alî.

Mirovekî dilsoj û wicdanpak, li kuç û kolanên ve diroka derewîn mîna gerokêkî, mîna destanbêjekî digere û bi gerê re, bi çavê serê xwe dibîne ku çawan îstgehên xwînê xwe dispêrin himbêza çiyân, çawan xewn beravêtî dibin, ku çawan berbangê çavliêmanê, çavrijayî û derizî di şeva sînoran de ji dayik dibe. Li herderê rastîya kuştinê ye, toza koçbarkirinê ye, gemkirin û girtin û sergerdankirina mirov û lawir û gîha ye û nixûmandina dirokê ye. Ev rastî rastiyên Selim Berekat in. Lewra diqire û dibêje: "vê rastiyê rawestînin"

Ehmed Huseynî

Selim Berekat di sala 1951'an de li herêma Qamişlo, li gundê Mûsêsanayê ji dayik bûye. Hin berhemên wî roman: "Hozanên Taristanê", "Giyanên Hendeşî", "Perik", "Leşkergehên Ebediyê"; helbest: "Wusa ez Mûsêsanaya belav dikim", "Quling", "Bi wan toran bi xwe, bi roviyên ku serkêşiya bagerê dikin", "Bazyar"; biranîn: "Sisirkê Hesişî", "Kiniştê Şervan".

## PEVÇÛNA DI NAVBERA HEMÎ TIŞTAN DE

## Selim Berekat û Romana Leşkergehên Ebediyê

Nizar Agirî

Selim Berekat bi pevçûna bê rawestan ya di navbera her du dîkan **Reş û Belek** de dest bi her pênc beşên romana xwe a nuh **Leşkergehên Ebediyê** dike.

Pevçûneke bê kutayî ye, geh haş dibe, geh gurr dibe, her du dîk xwe çem dikin û bi hev re difrin, hev du dinikulînin, hevdû dehd didin, dilukumin, xwîn ji nikulan diherike, perik li ber ba tarûmar dibin. Eger pevçûna wan bi hatina mirovekî ji nişkê de an bi hatina kuçkekî sergerdan bête birin, berê xwe didin cihekî dîtir daku pevçûna xwe bi domînin.

Bi pevçûna herdu dîkan romana **Leşkergehên Ebediyê** dergehên xwe vedike her wiha bi wê pevçûna bêkutayî dergehên digre jî.

Hevoka dawîn hergav wêneya dawîn ya pevçûnê ye: "dema ku pir derbas kirin, xwe ji ser keviya bilind ya rê ber bi roava de berdan. Daku di nav darên tuyê de wenda bibin".

Wenda dibin, lê her û her dê pevçûn û terprepa baskên wan xwe di hişê me de dubare bikin. Ma gelo pevçûna çakiyê li gel ziyana ebedî ye an pevçûna reş ligel sipî ye..?

Bi vî awayî dê pevçûna herdu dîkan di romanê de me rakişînin pevçûne dîtir jî; pevçûnê pirr alî û tevlihev, pevçûna di navbera xelkê û hêzîne biyanî de, ya di navbera êlan xwe bixwe de, ya di navbera raperînxwaz û hustuxwaran de.

Ev pevçûn taybetmendiyên wê xakê ne, xaka ku li Bakurê Rojhilatê Suriyê, li tenişt sînorê Tirkîyê ye.

Bi vî romana xwe yî taze S. Berekat nivîsandina diroka tevlihev ya wê navçeyê (mîna romanên xwe ên dîtir -Hozanên Taristanê û Perik-) berdewam dike. Wa dixuye ku her romanekê taze beşeke ji romanekê bê dawî, mîna ku (sed sal ji tenhatiyê be) ji tenhatiya gelê Kurd be, û S. Berekat hewil bide daku bûyerên wê ên belavbûyî berhev bike, ku ji nûve perçeyên wê dirokê di çirokek dirêj de bi ser hevdû de bicivîne, beş bi beş, li pey hev, bi awayê vejandina bîrê, bîra dahêner/çirokbêj ji milekî ve û bîra gelê Kurd ji milekî din ve, bi ser hev de kom bike.

Herdu bîr -a nivîskar û a Kurdanderbasî hevdû dibin, di cihekî taybet de tîkelî hev dibin, bîra yekjimar ya romanivîs direjî nav pêvajoya bîra pirjimar ya hemî Kurdan dibe û romana taybetmend digihêje romana giştî, her yek dibe hêrs û berdewamiya ya din, her wiha sedema wê jî çî di zencîra romanên S. Berekat de be, çî jî di hundirê her romanekê xweser de be, em hest dikin ku, em li beramberî romanivîsekî ku di her romenekê xwe de çend romanên cihê cihê, nêzî hev, hevbeş, berhev dike, radiwestin. Romanine ku bi yek carê teqiyane, bi hêminî diherikin mîna ku bêdawî bin.

Di romana Hozanên Taristanê de bûyera ji dayikbûna Bêkes cih digre. Bêkesê xwedan gêwlên (moral) seyr û ekzotîk, çûnûhatina wî li ser wan girên berfinî, girên nêzîkî wan sînorên ku wargehên Kurdan ji hev cûda dikin. Di romana Perik de em pêrgî çiroka Dîno û birayê wî Memo tîne. Memê ku bi derbaskirina sînor re ketiye xefkê, Memê ku li ber ava çem bi mirîti dizivire. Di van herdu romanên de S. Berekat bi rêveçûna kesatiya (şexsiyeta) Kurd dibêje. Ev kesatiya perçekirî, ya dudil û bêgav, ya reviyayî, ya ku li ser xakên livdar û bixirûcir baz dide, xakên ku ji bin lingan dişemitin, kesatiya ku mercên hebûna wê bi darê zorê jê tîne stendin, ku li ser sînorên tenhatî û şêtbûnê tê avêtin (Bêkes-Dîno).

Di her romanekê ji romanên xwe de S. Berekat bûyera realist tevli rûdana xeyalî dike û herduwan bi jidayikbûyîna bêdawî dabeş dike. Her weha di romana xwe î taze de jî **Leşkergehên Ebediyê** vî prosesê bi kar tîne.

Di vî romanê de, rûdan, bûyer, diyarde, raman û firîna helbestî ya zimên, şikenandina demê û tevhevkirina wan berdewam in. Prosesa çirokbêjîyê di romanê de xwe dispêre çend sewiyetên cihê cihê, ku bi hev re tevneke aloz û pir dolemend diafirînin:

## SEWIYETA REALÎST

Di vî sewiyetê de S. Berekat bûyera dirokî ji xwe re dike palpişt, ji wan nûçeyên ku di hişê romanbêj de bi cî bûne, nûçeyên ku di çarnedora xwe yî seretayî de tîne gotin, vedixwe. Lewra ê nivîskar bîra xwe ber bi paş de vedigerîne û nêçîra despêk û seretayîya nûçeyê dike. Wek hatina Firansiyan bo herêma Kurdan a li bakurê Suriyê û dabêşbûna xelkên herêmê di helwestên xwe de li hemberî Fransiyên biyanî. Hin hewl didin ku pêşwaziya wan bikin û dostaniya wan ji xwe re qezenc bikin, daku bi alîkariya wan bikaribin doza Kurdan çareser bikin. Mîna Celadet Bedirxan mirê Kurd û neviyê malbata Bedirxaniyên navdar ên ku serhildana li dijî Osmanîyan bûbû intrêsa wan û hin li dijî hatina Fransiyên rawestiyên û destdirêjahiya wan protesto dikin, lewra biryara berxwedanê werdigrin û li tenişt hêzên welatparêz ên ku li Suriyayê belav bûbûn, radiwestin. Ev serhildan li bajarê Amûdê bi serokatiya Seid Axa ê Deqorî dest pê dike.

Di vî sewiyetê de çirokbêjî bi şeweyekî nûçeyane tê pêşkêş kirin, di cih de û bi awayê balkêşana çirokvanî, herweha awayê raxistina dirokî werdigre "Gelek qantir di gorepîna fireh de rêz bûbûn, gelek zilamên peya bi rextan rapêçayî bûn, tîving li ser milên wan bûn û hin zilam jî li ser hespine torebûyî siwar in, di nav wan de "Seid Axa" eba xwe î zer li newqa xwe pêçabû... Dê êrîşê bibin ser leşkerge-

hek Firansî". Lê belê ev sewiyeta realist ne tenê bi bûyerên paşerojê ve ên ku li herêmê çê bûbûn girêdayîye, çimku li ser zemîna (Anuha) jî radiweste, ango di nav vî pevçûna di navbera kesên jûndar de ên ku bi hev re "qehremanê" romanê dadimezirînin wek -her çar keçên (Mûsa Mozan) û pitepita wan ya bê dawî, ew kesên dîtir ên ku çarenûsên wan bi keçên Mûsa Mozan ve girêdayîne. Ev kes hemî bi derdên xwe î rojane mijûl dibin -xew, xwarin, pere-, perên ku (Ni'manê Hec Mecîdo) wan ji şofertiya di navbera Qamişlo û Hesiçayê de dide hev. Li vir hûnandin û diyalog bi awakî pir ciwan û bi bîrtûjiyê tîne xemilandin.

## SEWIYETA SÎMBOLÎ

Ew sewiyet xwe dispêre kesên romanê, kesên ku romanivîs wan derfîne daku di tevna romanê ya bingehîn de erkekî amajane pêk bînin, wek: Mekîn, Nefir, Kelfime û berdeskê wan ê di çeşnê kûçik de. Ev kes jî nişkê ve derbasî atmosfera romanê dibin. Ê xwendevan giranî û nakokiya wan kesên li gel dîmena giştî ya çirokê, hest dike. Peyvên wan veşartî û ne diyar in mîna hatin û bizava wan, mîna derbasbûna wan î nehênî a odayekê ji odayên keçên Mûsa Mozan. Ev kes hevkeşeke vebêjîyane li tenişt aliyê şexsî ê çirokbêjîyê pêk tînin:

"Di despêkê de her pênc keçan guh nedan bilêvkirina seyr ya Kurdiya zilam û her du jinan, lê belê dema ku her du jinan xwest in bi zilamê ku pê re pev diçûn bipexivîn, bala wan xweş kişand".

## SEWIYETA ZIHNÎ

Di vî sewiyetê de S. Berekat bixwe wek dahêner derbasî nav romanê dibe daku bîr û baweriyên xwe li ser bûyeran ji me re bibêje. Wisa ê nivîskar bûyerên ku dibin, li ser zemîna wênekêşana metafizîkî û felsefî, dijî û digihêje sînorine bê hempa ji rût kirinê (tecrîdê), li vir ziman digihêje sînorên berzbûna rehayî (mûteq) û nivîsandin digihêje rada neqşeke bêdeng li ser cawekî spî. Bûyer xwe jî rê dide alî û hebûnên hestdar (hîsî) ji devê rê derdikevin, meydan ji herikîna bê rawestan ya peyvên tîr û çêkirî re vala dibe. Herweha prosesê romanê dibe lîskeke peyivîyane î şarezane, her ku pêş de diçe bilind û pîrozmendtir dibe ta ku xwe digihîne qonaxa berzbûnê. Ziman dixuye weku jixweya xwe gurr dibe, bi nehênîyên xwe î taybetî mijûl dibe, ji giraniya bûyer û wênayan û ji ramanan rizgar dibe daku xwebixwe, xwe bêje. Ji her tiştî rûtîkirî, tiştên di nava xwe de vedike, û bi sivikayî bîyî ku guh bide wênegeriya -pêşende- wan belav dike.

Li vir ziman wek ku ji xwe ve ji dayik dibe û hêdî hêdî dibe mebesta xwe. Zimanekî di çeşnê rengên serberdayî ên tabloyekê de ye

→→→



# Têramandineke nîvco li ser Mehabada helbest

## Umêd Mehdî (Hindrên)

Di destpêkê de dixwazim bêjim ku nîrxandinek û tîremandineke rexnekariyane li ser rada teknîk û deq (Tekst) û gorepana ezmûneya (tecrûbeyê) awir-cihanî ya ezmûnbexş Selîm Berekat: S. Berekatê helbestvan û romanivîs -lîskvan-bi giştî û bi taybetî lîskvanê helbestê, pêwîste hemû deqên wî ên helbestî li ber destan amade bin, lewra ji bo pêkanîna vê erkê, şarezayî û şiyaneke rexneyî û afe-randerane gerek in.

Helbesta S. Berekat deqekî kûr û aloz e, ji bo wan çavên ku hîn xwendina deqên hêsan û normal bûne tiştekî seyr û nenormal dixuye, çimku S. Berekat hemû tiştên normal û ên ku hatine ji birkirin ji nûve vedijîne, raperîn û serhildanê berdide hundirê tiştên asa û naskirî, herweha giyanekî taze di wan de diçîne, tiştên rawestyayî dilivîne û pevçûnê di navbera wan de di dayik dike, peyv û wişeyan ji qalîkê wan rizgar dike.

Îcar ev bejna helbestyane a ku herûher rehên xwe dadîçikîne, pêdiviyî rexnegirî bejin bilintire, herweha pêdiviyî wicdanekî rexneyî yê mezî û ezmûnkar e, lê ê min, tiştê ku ez dehî dam nivîsandinê ve awira sivik û rawestana giştî, bi rastî, ji dest xwe derçûn bû!!

S. Berekat bûnewerekî sermest û sergerdan di nava wî bûnewerê zingargirtî de ye, di kêlikên ji birkirî de di hundirê wan kêlikên jibîrbûyî de ye, ligel diyardeyên wan tiştên bê can û ên bêbizav û ên bican û bibizav, bûnewerekî helbestyane diafirîne.

Helbest û roman du pencereyên S. Berekat in, di van herdu pencereyan re rehên xwe ber bi aso de radikişîne. Bi van herdu (helbest-roman) afirandinên mamikane î şoreşgêrane (ne bi wateya xwe ya rojane û naskirî!) di rûyê ve çihana giyanekî û bêrûmet, newekhev, ya ku di nav pêlên stemkariyê de bin av bûye, radiweste, wisa bi şoreşgerî mîna ku çihaneke mehal dirûst dike. (Ev jî arezûya rastîn a helbestvan e!!). Çihaneke ku hêdî hêdî bi aqilekî otomatîk tê ajotin û hêdî hêdî bûnewer ji bi agahî li beramberî wê radest bûye û bi bêagahî bi seqema wê re kêfxweş dibe, herweha bi agahî jî pê tê xapandin. (Ne xwe divê xewna helbestvan çibe) S. Berekat wek bûnewer Kurdê Erebnivîs e, di çihana helbesta Erebi a nûjen de xwedan ezmûneyekî taybet e.

Îro hin ji rawestên Kurd xwe bi nasname û Kurdîtiya wî paye dikin û bi awakî pir remakî (içgüdü-fitrî) û sozamez (hisî-atîfî) kêfxweşiya xwe bi navdariya wî tînin, bêguman helwestên bi vî awayî, hejarî, nezânî û tene-gihîştina helbestê nîşan didin, herweha hin ji rawestên deqên helbesta S. berekat li ser Kurdî dihesibînin!! Bêguman e ku S. Berekat di helbesta xwe de sofiyekî cezîm girtî ye, ser bi navçeyek birîndar diçe û bê terîqet e. Birînen ku di helbest û romanên wî de cihdigirin bi qasî wan

birînen ku di nasnameya wî de ne. Lê!! ev deqên ku bi Kurdî hatine nivîsandin, mebesta min ên nivîskarên ku xwe xemxur û xawenên hizir û ramana Kurdîtiyê dibînin, ên ku xwe wek dahênan dinasînin û çend sewiyatên edebî ji pesindan û payetiyê dane xwe, gelo ma ji bilî girî û şînan û deq-diqandina hestan tu tiştekî din pêşkêşî me kirine!!? Ma gelo bi qasî ku tirajediya Kurdî em hejandine, em surdar û matmayî kirine, wan em mat û surdar kirine? Wek me go, di nava jeografîya helbesta tazeger a Erebi de S. Berekat xwedanê cihekî taybet û balkêş e. (Bêguman, çimku nasnameya wî Kurd e û ji ber ku hizirên Kurdayetiyê di helbest û romanên wî de eşkere ne, di gorepana rexne û guhdanê de piraniya dezgehên rawestên ên dewletan û pir caran ên serbixwe jî, bi şeweyekî ji şeweyan, ji ber sedemên siyasî û nijadperestiyê, perdeya bêdengiyê berdane ser û mafê wî nedanêye)

Îcar eger (deqên nivîsandî) ên S. Berekat û ên wan nivîskarên navdar ku Kurd in û Erebnivîs, Faris-nivîs, Tirk-nivîs in, wek deqên Kurdî bihesibînin, eger wabe bo çî em çend ezmûneyên wisa di zimanê Kurdî de nabînin? Eger ne wabe, bo çî em dibêjin ku helbesta Kurdî bi taybetî û edebiyata me bi giştî di astengê de ye?!!

Ev pirs û çendên din jî, sade ne, lê li ser rawestan pêwîst e, herwiha pirs ne ji çêkirina min in çimku di pêvajoyê de ji dayik dibin. Ji bilî çend nimûneyan ên çend deqên çend helbestvanan (wek deq ne wek ezmûne) li gel ku ev deq jî, bi vî rexneriya ku taze hatiye bigewde kirin, bi awakî kûr nehatine rexnekirin, ji vî zêdetir jî rexneriya îro ya ku xwe nûjen dibîne çimku xurîstî û ne gihîştîye, dide dî deqên navdar û naskirî, wek diyardeyek tazegerî edebî, guh nade bizava nûjen û eger guhbide jî, bi şeweyekî taze lê bi hizirên kevnar dinirxîne, her û her nikarin wê xelesa girtî bişkînin, wate rexnerî ji kevnepoyîyê ber bi kevnepoyîyê de diçe.

Îca ji bo ku em bişên bersiva pirsan bidin, gerek em li sewiyeta pêşveçûna hestdariya zimên û li sewiyeta tevgera rawestên û li sewiyeta xwendevanên xwe û li sewiyeta wan kesên ku bi helbest û wêjeyê mijûl dibin û sewiyeta hizra giştî, temaşe bikin; herwiha çend faktorên din ku ji gişan pêwîstir nêrîna li doza Kurdistan e, wek girîngtirîn hokar, bi pîvanekî jîrane li xwe biramin, ne bi hest û sozên çosane.

Îca, di serdemeke wisa jihevketî û tevlihev û toltîr de (bigiştî) û (bi taybetî) li Rojhilata Taifeger, hêzbaz û kevnepereş, ji bo ku edebiyata me li beramberî girêkên hebûnê û aloziyên heyîne hêjayî bûnê be, gerek li ser pirs-girêkên hebûnê, li ser çiyetî û cewherê doza me raweste, wek giranî, wek tirajedî, bi pîrsek din, gerek ev edebiyat bersiva pirsên me ên gumandar bide, ne ji bo bi cihkirina awirên sade û listina bi hestên me.

-Helbesta Mehabad jeografiyeye birîndarkirî ye, mişt xirecir û

raperîn û amaje ye, hilgira pirsên diramayane ye. Li Mehabad bayê birîndarbûyî gerdûn dirêse. (Mehabad) wate (Helebçe). Laşê Helebçe ji laşê helbesta Mehabad e, bi qasî wê gorepana fireh a çarenûsa jibîrkirî ye. Ji cama pencereya helbestê, sirûst û sîmayên lîskevanan û helbestvanê lîskevan ê ku lîskeke giran li ser ferz bûye, lê lîskeke girantir berz dike, deng û reng û hemû rûdan li ser kolana pirsiyara helbestî de hevdû mehir dikin û li wira bûna dirûstê dirûst dibe. S. Berekat bi tevna wêneyên helbestiyane yê nakokiyane, bi harmoniyeke çejdar çameyê (qesîdê) di-hûne, harmoniyeke ku bi ser angoyan de dike zingezing û simfoniyeke tirajedî ber bi jor de hildikçe.

Hestî bi zinge zing in  
Goristan bi zinge zing in

Ji vî laşê helbestî Mehabad ji dayik dibe û di nav vî laşî de jî, laşê dirûka dorpeçkirî me dorpeç dike.

"Mehabad" mirovek e di listgeheke bi pevçûn de dijî; nasnameyeke şoreşgêr e ser bi welatekî jibîrkirî de diçe. Ê lîskevan; reng e S. Berekat bixwe be jî, bûnewerê xwe yê jibîrkirî zindû dike. *wek êşekê bask dirin bi pêş de wek êşekê Kurd ber birastiyê de dirin.*

Li vira em dibînin ku Selîm Berekat rişma destpêka dozê bi alf cergê ve çihane de radikişîne, ev çihana ku di çesnê lîskgehek pêşbirkeyî de ye; ku fermanîdar û zorbaz û sextekar tê de dilîzin. Wisa S. Berekat rişmê dikîşîne û li ser banekî helbestî yî mermerane radiweste û serhildaneke mehal dest pê dike û dibêje:

"Vê rastiyê rawestînin!"

## BEŞEK JI HELBESTA MEHABAD

Ey Xwedayê min,

Ew Kurdên te ne Xwedayê min

... û bindeq tarîmar dibin. Hincas tarîmar dibin. Hirmî rolan elabeş dikin, û genim bi xwe re dipeyive:

De bila gulegenim viyana mirîne be, de bila mirin, di tengereyên ku kilsa wan diwere, ku rewî peyivînen xwe î bişûndemayî bi kurtepesteke nizim tê de diaxivin, bi xirecirtir be.

Tu ey Firîşte min bi gunehkariya jîndaran neşewitîn, çimku ez jî -wek te- çarenûsan wek xoxê li bêhûdekarîna dabêş dikim, û bi destên xwe ên sermest reşîkê xwe di dergêh re davêjim daku bi çîrokên xwe jîyanê dilxweş bike.

Li hêviya min raneweste jî, çimku êmin wek yekî -ku di çîrokan de baz dide- tiştê ku nayê gotin min direvîne, ez dibim kutayî dema ku destanbêj gotina xwe ya dawîn bi dawî nake. Eger tu wa dibînî ku tu î bi pey min keví, de darwana xwe î dirêj bilind bik, pêlavên xwe î sportane li pêy xwek, çimku tu jî wek min -wek ê ku di çîrokan de baz dide- de giraker di dagîrkirina pesindanê de dergêh bi dergêh te dabêş bikin, bi bextên ku tirs pîrozbahîya wan dikin.

Û ji "Mahabad" ta "Mahabad" wek min tu piçekî ofeofê dikî ey frîşte, tu qeytanên pêlavên xwe vedikî, tu gumlekê xwe î axîni ji xwe dikî, tu hetanî hestîyan himasê dikêşî, mîna ku pesindanan tu ji qîregirîna xwe rizgar kiribî, û fiqetîq bi ser te de grîya be, mîna ku gelaciyeke din

dê te

ji

esmanekî

ta

esmanekî dîtir

bikişkişîne,

û êş te kurt dike, êşa ku ba wek paltoyekî bi çengelê xwe ve hiladiwestîne. Û ji şewatekê ta şewatekê, de bila qeder talanê ji xwe re ji pitepita Kurdan ya ku pê tiraliya xwe î zêrînî li ser zemîne dibêjin, qezenc bike, berya ku ên bazdayî bi reşîkên xwe perjana sibeha wan a tirsîyayî dagîr bikin, û gumlekên xwe davêjin daku ba germ bibe û pêlavên xwe ji dorpeçiyê re dihêlin ta ku dorpeçî brîndaran li ser piyan ji gulana gulana biguhêzîne.

û bager?! çî pê hatîye?! ji "Mahabad" ta "Mahabad" jî.

Hemî ji "Mahabad" ta "Mahabad"

Her lêdanek ji "Mahabad" ta "Mahabad"

Her qîregirîyanek ji "Mahabad" ta "Mahabad"

Û dayikbûn jî bi memikên xwe ên kevirînî di nav zarokên xwe de dudil e:

Eger Xwedê di pesindana hêwî a xwîne de ez şiyar dikirim, min pêlavên xwe amade dikir, û eger xwîne ez şiyar dikirim min xwedê amade dikir.

Lê, wek êşekê bask dirin bi pêş de:

Wek êşekê Kurd ber bi rastiyê de dirin.

Wek êşekê berbang koçe koç şungehan ji keçên xwe re dibilîne;

Wek êşekê ro bikorî derbasî "Mahabadê" dibe

Û ez,

koçe koç - bi wê darewanê bi xwe; bi herdû pêlavên sportane, û bi çepklêdana laî li ser mîrdewanan jibîrbûyî, ku ti kes hilnekişîya-xwedanê ji ser enîya te zuha dikim ey firîşte, bi hestiyên xwe baskên te radigrim, daku wê xaka ku li paş te, bahoz bi bahoz, ciwanî bi ciwanî hildiweşe, himbêz bikim, daku tîra dawîn berdim rexên xwîna dawîn.

pişt re, ez dê xwe

nalîn bi nalîn,

ji "Mahabad" ta "Mahabad"

bihejmêrim.



# OSMAN SEBRÎ DÎNYA XWÎ BEDÎLNAY

## Malmîsanij

**"Yektî me divê, me rê ew e, em dê biçin her,  
Yezdan arîkar bit  
Serdestî jibo me ne pirr e em dê bibin, ger  
Cihan bi neyar bit."**

Yew embazî telefon di xeberî day mi va "Zanî Osman Sebrî dinya xwî bedilnaya". Mi va "Key?", va "Vanî yewndesê menga (aşma) desini di." Mi va "Kamî va?" Va "Sûriya ra yew embazî telefon kerd, va."

Mi nişna sewbîna zaf çî persa, embazî telefon di tikêna qalî kerd, mi zî bêhemdê xwî cewabê yê da labelê hêşê mi cayna bi, ma zaf dergi nêkerdi. Ez kewta vay vîr û xeyalan ver. Çendi lezi şono vay xeyalan! Ne teyara ne fuze ne çîna vay vîr û xeyalan reseno.

Seki na gami bo, hewtê Temmûza 1982 di yew êrewo teng di ez û Rojen Barnas û yewna xorto Kurd ma Şam di şî key Osman Sebrî.

Hinî pîr bibi. Ma ki şî, pijemey yê pira bî. Ma ver ra werişt, Kirdasî weynda yew keyneki da, ma rê qahwe waşt. Keyneki qahwe, dima zî tikê pasta ardî û hewna şî teber.

Mi namey yê reya ewilî 1975 di eşnawitbi. Weş mi vîrî yeno, Weşanxaney Komalî newe Devrimci Doğu Kültür Ocakları Dava Dosyası-I vetbî. Mahmut Kılıço ki nika (inka) meb'us o, ay wext kitabê Weşanxaney Komalî vila kerdîni. Ez şîbîya mi Semsûr di ay kitab Mahmut Kılıçî ra girewtbi. Kitab, mi rê sey malê dîna bi. Ez senê ki minîbusi wenîşt, mi dest bere kerd pelê kitabî qelibnay, mi waştîni ki lezkanî biwana. Tanî mêrdimê ki a dosya di namey yîni viyartîni mi şinasnaynî, ay semed ra mi kitab zaf meraq kerdîni.

Minîbusa ma hima nêwerişt, ez ha kitab ro xejiliyaya, mi rayanê minîbusi xwî vîrî kerdî; mi dî ki telebanê min ê lise ra yew xortî va "Merhaba hûcam" û mi ver di ronîşt. İno xort xortêdo şoreşgêro erjaye bi. Yew dewa Kurdanê Elewîyan ra bi. Tira ver zî ameynî mi hetî şîni. Ma ki pê persay, çimê yê kitabdê mi ra mendî, vengê xwî nêkerd labelê seki vajo ho kitabo qalin çî yo? Ez hewniyaya ki şermayêno, mi kitab yê desta na, mi va "Eke ti wazenî, biney tira bewnî". Lajekê to girot tira hewniya, ez nêzana çindi wend nêwend, labelê mi dî nişka 'abiqiya, va:

-Ûsman Sebrî! Ûsman Sebrî!  
Na rey (fini, gilangi) mi nêzana se vano. Mi va: -Ti se vanî?  
Va: -Hûcam, Ûsman Sebrî!  
Ez hewniyaya, cawo ki lajekî engîşt, xwî ser naya namey "Osman Sabri" nuştewo. Mi va "Osman Sabri kam o?". Lajek seki vajo ti senê Osman Sebrî nêşinasnenî û mi rê îzeh kerd ki Osman Sebrî (yê vatnî Ûsman Sebrî) Kolikij o û remawo şîyo Binê Xeti. O zî peyhesiyabi ki Osman Kurdkî kitabana nuseno, labelê bawer nêkerdî. Semedo ki nika namey yê no kitab di dibi zaf

keyfê yê ameynî.

Dima mi meraq kerdî, ez sewbî Kolikijan ra persabiya, yîni zî derheqê Osman Sebrî di tanî ma'lumat dabi. Vatişanê tanî Kolikijan gore, o zaf camêrdêk bi. Vatnî rojê waya Osman Sebrî şîya ki şêro Binê Xeti yê hetî, sîndorî ser o cendirmanê yew qereqolê Tirkî ceneyki tepîşt, namûsê yay herimnawo. A zî şîya Osmanî ra vato, Osman şew amew eşto ay qereqolî ser, duyes cendirmanê qereqolî ra yewndes hebî serebirmay, tira yew cendirmewo Kurd tena nêkişt, serbest verra dawo, çimkî vatişê cenêki gore, ay tena têkilê ja nêbiyo. Binê na mesela esto-çîno ez nêzana.

Şam di ez ki pey hesiyabiya ki key Osman Sebrî weyra wo, mi zaf meraq kerdî û seki mi va, ma şîbî yê hetî. Ma ki yê het ra agêray, mi a şewî derheqê ziyaretkerdişê ma di defterê xwî di çendi riperî nuştî:

Ma qalê kamî kenî, Dat Osman Sebrî tira lomey keno, hima hima ki yewekî ra razî niyo. Bellî yo ki

zaf bêbextey bider biya.

Ma qalê Nûrî Dersimî kerd, va "Fikrê min û yê ciya bî." Kê fam kerdnî ki tira weş niyo. Bedirxaniyan û Cemilpaşazadeyan ra zî abiasan. Va "Hemîni di, vizêrênan di zî, ewroyênan di zî ruhê axayey esto, ruho xebîs (pis) esto."

Qalê key pi xwî kerd va "Pi mi, datê mi axa bî. Ma pêti bî, Herbê Şêx Seidî dima şarî zorî reydi ma kerdî camêrd (peye)."

Va "Yew qala Tirkî esta, vanî 'Qocaqarînin bîrî cennete gîtmek îstemiyormuş, s... s... göndermişler", dima zî hiwa va "Mêrdêkan ebi zorî reydi ma kerdî camêrd".

Vatişê yê gore, merdişê pêrdê yê ra pey, datê yê Şukrî o weye kerd. Datê yê dey rî zaf rind biyo. Cûka datê xwî ra hes keno.

Herbê Şêx Seidî ra pey hukmat di datan, di xalanê Osman Sebrî, yê bi xwî û 270 mêrdiman 'eşîra yîni ra wazeno Mehkema İstiqlalî. Niyan ra datê yê Şukrî û yew xalê yê xwî danî dest, ay binî xwî nêdanî dest. Mehkema pancês serrî ceza dana datê yê Şukrî û qerar dana ki yê biersawo Antalya. Xalê yê verra dênno. Xal ki yeno keye, vano, "Datê to vatîni ti ganî bêri rayirê Antalya ser o bierzî eskeran ser, mi yîni dest ra vejî."

Osman Sebrî zî goş datê xwî nano, çend suwariyan gêno şonî Ruha di pabey yîni vîndenî. Gama ki eskerî Şukrî anî, Osman Sebrî û embazê xwî Şukrî yîni dest ra vejenî, şonî mintîqa xwî.

Demey koyan ra manenî, eskerê dewletî rameno yîni ser, datê yê reyna tepîşiyêno. Dima Osman Sebrî, datê yê Nûrî û tanîna embazanê yîni zî tepîşenî, benî Meh-

kema İstiqlalî, Diyarbekir. Ebi qerarê na mehkema, 1926 di datanê yê Şukrî û Nûrî xeniqnenî, ceza danî Osman Sebrî û embazanê yîni û yîni erşawenî Anadolu, Denizli.

Osman Sebrî nizdî di serrî weyra hepisxane di maneno. Dima 'ef vejîyêno, o zî verra dênno.

Vano "Verî haya mi zaf siyaset ra çinêbî. Ebi no hewa mi wina nişka ra xwî siyasetî miyan di dî." Dewam keno, vano "Xortaneya mi di, bi namebê İsmail Efendî yew ma'lum amebi dewa ma, yê ez banderê zaf çî kerd."

"Demewo ki hima ez û datê xwî ma hepisxane di bî, çend hebî eskerî bî, eki ma biwaştîni şînaynî ma rê şeşdarb biyarî. Rojê mi datê xwî ra va 'Dato, wa nê ma rê şeşdarban biyarî, ma mehkema di pa nî hakim û sawcî bikişî.' Datê mi va 'Heyanî ewro mi tanî şaşey kerdî, ma na şaşey nêkî. Lazim o ki ti bixelişî û mucadele bikişî."

Osman Sebrî hesri anceno û vano "Dat Şukrî di fikrê welatperwerye bîy. Demewo ki dekewtbi Hepisxaneyê Xarpêtî, Hesen Xeyrîyê Dêrsimijî hetî mendî. Hesen Xeyrî tesîr bider kerdî."

Osman Sebrî û tanî axayan û serek'êşîran 1929 di reyna tepîşenî, na rey benî Mehkema Eskerî ya Meletya. Na mehkema di hakimî Huseyîn Husnîyê Dêrsimij biyo. Huseyîn Husnî verî qeymeqamo eskerî biyo. Wextê Cengê Cihanî yê Verîni di cephe di, ordî Tirkî reydi, vera Yûnanan lej kerd, birîndar biyo, linga yê seqet menda. Dima no wezîfe dawo bere. Rojî Huseyîn Husnî veynda Osman Sebrî dawo, ti ra vato:

-Ez zî Kurd a. Ez nê Tirkî ser o, ceng di birîndar biya, nika zî ver a çimanê mi şarê (xelqê) mi qirr kenî. Ez to verra dana labelê biremi, nêki Tirkî to awê danî, kişenî.

Osman Sebrî vano "Ay camêrdî ra nêbinî, ez a rey nêxelisaynî."

Huseyîn Husnî qerarê veradayişê Osman Sebrîyîni İsmet İnönüyê erşawito, İsmetî bi xwî zî de'wa tehqîq kerd û Huseyîn Husnî rê telgraf erşawito, vato "Nê mêrdimî suçdar î, newe ra qerarê xwî ra biwîni." Yanî seki vajo Osman Sebrîyîni 'idam biki. Huseyîn Husnî telgrafî reydi yew cewabo sert dawo İsmet İnönüyê.

Osman Sebrî vano "Huseyîn Husnî nê telgrafî bi xwî mi nawitî, ez tersan ver recifîyaya."

Peynî di İsmet İnönüyê qerar qebul kerd. 'Aya ser ra Huseyîn Husnî veynda Osman Sebrî dawo, vato "Sağır köpek imana geldi!" (Kutiko kerr ame imanî ser!)

Osman Sebrî ki 1929 di hepisxane ra verra dênno, şono Sûriye. Weyra beno endamê Xoybûni, welatparêzanê Kurdan ê bînan reydi xebitîyêno.

Vano "Ez 'emrê xwî di -hetanî 1972- heştês rey (finî) dekewta hepisxane. Di rey Tirkîye di, di rey İraq di, yew rey Lubnan di, ay reyanê bînan zî Sûriye di. Hirê rey ez surgun kerd. Sûriye di hepisxane ra verradiyayîşî ra pey zî ez binê kontrolê polîsî di ya." Dima vano "1970 ra pey mi fek xebata aktîf a siyasetî ra verra da."

Persayîşî mi ser ra, qalê yew mehkema xwî -Sûriye di- keno. Hewawo ki vano, mehkema di

tawiz nêdawo. Vano:

-Min û serekê mehkema ma mesela Kurdan ser o sert sert munaqêşe kerd. Min û yewna pîlê jîni -yo ki nika wezîrê Sûriye wozî ma yew rey wina munaqêşe kerd. Hakimo ki ez qalê yê kena, mi ra va "Ti mêrdimêdo şoven î." Mi va "Şoveney karê serdestan o, ez bindest a. Serdest ti yî, şoven zî ti bi xwî yî." Hakimî va "Ez şoven niya. Biewnî no katibê mi Kurd o. Eke ez şoven bibinî ez ka Kurdî nê yew 'Erebî bika katibê xwî!' Mi va "No Kurd niyo!" Hakim mi ro qîrra, va "Ez to ra vana Kurd o!" Ez zî yê ro qîrraya, mi va "Ez to ra vana Kurd niyo! Eke Kurd bibinî ka to hetî nê mi hetî ca bigîro!"

Dima, mi ra hewnêno peşmiriyêno, vano "Hûmay esto, ganî mêrdim raştî vajo. Be'dî ay katibî mi rî yew jest kerd. Wexto ki ez hinî hepisxane ra vejîyaynî -zey nefeqey hepsî- tanî 'deynê mi' bi, ganî mi bidaynî hima ez hepisxane ra bivejîyaynî. Ez şîya ki ay deynî bida, ay katibî va 'Wexto ki Nûreddîn Zazay deynê xwî da, mi yê ra vîşî girewt, yanî mi deynê to zî Nûreddîn Zazay ra girewt. Deynê to nêmend!' Herçiqas ki ay pery (deyn) zaf nêbî zî keyfê mi ame. Çimkî, semedo ki hepisxane ra verradiyo Nûreddîn Zazay mehkema di tawiz dabi."

Belkî semedê camerdekeya xwî ra reya ewilî herinda ceza di Dat Osmanî mukafat dibi. Coka gama ki na mesela vatîni çimê yê bereqiyaynî. Vatîni:

-Nûreddîn Zazay semedê "meşrûten texlîye" rê murace'et kerd, mi nêkerd. Mi va eke ez murace'et bika zeki ez poşman biba. Ez poşman nêbena.

Mi va: -A rey ti hepisxane di çendi mendî?

Va: -Çiyêdo sivik bi, ez vana qey serr û nêmi bî.

Qali yena pîrey û sihetê yê ser. Vano:

-Embazanê mi vatnî "Ûsman bi destbê xwî şono merg." Ay embazanê ki wina vatîni heme merdî, labelê ez hima weş a. Her roj bi hezaran mêrdimî ecelê xwî reydi nêmirenî?

Vano: -Ez zana mentiqî niyo labelê ez wazena şêra welat. Ez vana qey topi mi ra nî û topi yew letey leşa mi bero zî ez pay ra manena.

Ma ra yew vano: -La ki Tirkî to bierzî hepisxane?


Vano: -Bewnî na nêbî. No 'emir di hepisxane zehmet o. (Demewo ki ma tede qalî kerd Osman Sebrî hewtay û hewt serre bi.)

Ez persena vana: -Ti surgunê kuray kerdî?

Vano: -Nizdî Afrîqa di, di yew cezîre (ada) esta, tira vanî Madagaskar. Frensizan ez surgunê Madagaskarî kerd.

Ez xwî pîze di vana "Madagaskar kura Kolik kura?"

Ay beyntar di sewbî meseley abenî, qalê çinay beno. Mi vîrî keweno ki Lajê yê Welat Sûriye ra amebi Kolik û weyra kişiyabi. Demewo ki ez Kolik di biya kuştêxê lajê yê Welatî, hepisxane ra verradiyabi, ez ay wext mesela kiştîşê yê pey hesiyabiya. Mesela waya yê zî cendirman zî mi vîrî kewena, ez meraq kena tirê zur a



Osman Sebrî (sal 1984)

(Foto: K. Î)

**"Sed carî mixabin jibona gewreyên Kurdan  
Bo malê dinê gaca ol û namûsê berdan  
Sed carî mixabin jibona şêxên terîqan  
Gîş bûne pepûk, ketine bin awir û zîqan  
Sed carî mixabin jibona zanayên bêkêr  
Hinde serî danîne, Tirko mizgeft kirin dêr  
Sed carî mixabin jibona xortên minewer  
Çav dane xulamiya neyaran bûne bêper  
Sed carî mixabin jibona civîna bêdeng  
Diyar e li nik wan nemane tu şêr û leheng  
Sed carî mixabin jibona axa welatî  
Em xapîyan ko me sipart wanê nekêrhatî  
Sed carî şabaş û spasan li kir û derbend  
Ko tê de rabûn Birho, Dawid, Îhsan û Ferzend!"**



Li Hambûrgê hefta Kurdistanê  
**Panel li ser rojnamavaniya Kurdî**

Di 25.10.1993'an de li Hambûrgê hefta Kurdistanê ku ji aliyê Federasyona Weqfa Perwerde ya Keskan, Haus fur Alle û Hevkar ve tê organîzkirin dest pê kir.

Çalakiya roja pêşî ya hefteyê, li ser rojnamevaniya Kurdî li Bakurê Kurdistanê bû. Di panelê de wek axaftvan **Berpirsyarê Giştî yê Medya Guneşî Osman Aytar, Bîrpirsyarê Azadî yê kevin Sedat Karataş û li ser navê Ozgûr Gündemê Ali Osman Olmez** beşdar bûn.

Di panelê de axaftina pêşî Ali Osman Olmez kir. Ali Osman di axaftina xwe de got: "Ji roja Ozgur Gündem derketiye heta nuha li dor 3 trilyonî pere û ji 600 salî zêdetir ceza girtiye. Ji 200 hejmarî zêdetir hatiye civandin, 7 muxabîr, 2 nivîskar û 7 belavkerê Ozgur Gündemê hatine kuştin".

Osman Aytar jî di axaftina xwe de li ser dijiwariyên çapemeniya Kurd sekini

û pêwistiya lezkirina damezirandina Yekitiya Çapemeniya Kurdî kir û got di vî warî de hin gav hatine avêtin. Osman Aytar axaftina xwe weha domand: "Çapemeniya Cumhuriyeta Tirkîyê li ser bûyerên Kurdistanê û Tirkîyê bi hesasiyet nasekine û di nûçegihaniya rasteqîn de du xetan dajo. Çapemeniya Kurd jî tenê dimîne, ew jî pêrgî tehdît û tadeyan dibe. Rojnamevanên Kurd tên kuştin, cezayên pere û hefsê digrin û rojnameyên wan tên civandin. ....Em sansura PKK'ê ya li ser çapemeniyê rast nabînin, em li dijî hemû sansurên ku li ser çapemeniyê ne".

Di dawiya axaftina xwe de Osman Aytar li ser rewşa Medya Guneşî rawestiya û van agahdariyan da: "Medya Guneşî piştî 12 Îlonê rojname yekemîn a Kurda ye. Ji 35 hejmarên vê rojnamê di derheqa 32 hejmaran de ya mahkeme hatiye vekirin ya jî hatine civandin. Di derheqa xebat-

karên wê de bi deh salan cezayê hefsê û bi sed milyon cezayê pere hatiye dayin. Piştî qanûna terorê rojnamevanê pêşî ku hate girtin ez bûm..."

Sedat Karataş jî di derheqa Azadiyê de hin agahdarî dan: "Ji 75 hejmarên Azadiyê ku derketine 24 hejmarê wê hatine civandin. Hejmara 39'an ji ber sedema nivîseke ku di wê hejmarê de derneketiye, hate civandin. Bi salan cezayê hefsê û bi milyonan cezayê pera dane xebatkarên Azadiyê. Dewleta Tirk dixwaze pîrsa Kurdî bi darê zorê hel bike, şerê kirêt di hemû waran de dom dike, çapemeniya Kurdî jî ji vî para xwe digre. Ambargoya PKK'ê ya li ser çapemeniyê rewşeke ku mirov daxwaz nake ye, lê ji xwe medya di vê herêmê de bi karê xwe ranedibû".

Panel bi munaqeseyên bi kêr dom kir. Hejmarek mezin temaşavan panelê gûhdar kirin.

**Dûmahîka nivîsan**

**Li dijî têkoşîna gelê ...**

wan bikin ji 3 salan heta 5 salan cezayên hefsê û 100 milyon jî cezayê pere bê stendin. Ger weqif, komele, sendîka, şîrket û mueseese alîkariya maddî bidin van rêxistinan, ewê bîr girtin û dest deynin ser mal û pereyên wan.

Ji xeynî van xalan endamên van rêxistinên illegal di hefsan de wê di hucreyên de bimînin û

ji seredanên vekirî bêpar bin.

Di vê fermana nûh ya dewletê de, du fenomenên nûh hene ku ew jî li hember esnaf û şofêrên Kurd stendina "tedbîrên" nûh in. Bi van tedbîran dewlet dixwaze çavê wan bitirsîne, wan li hember bûyerên ku li Kurdistanê diqewimin guhnedar (lakayt) bihêle û wan ji têkoşîna

neteweyî û demokratîk ya gelê Kurd dûr bixe.

Lê êdî piştî vê qonaxê dewleta Tirkîyeyê çiqas fermanên nûh derxe bila derxe ne mumkun e ku wan di jiyane de pêk bînin. Ji ber ku îrada gelê Kurd, têkoşîna wê ya bi adil û şiyarbûna milî gihîştîye pêvajoyek wisa ku ferman û yasaxên dewleta Tirk pûç dike.

**Lewend Firat**

**Xwîn diherike...**

nên dewletê ne bes in, yê Hizbullah û PKK'ê jî lê zêde bûn. Li gelek ciyan vexwarin, cixare, temaşekirina televizyonê, serqot derketina jina qedexe ye.

PKK, muxabîrên rojname û ajansên mezin derxist derveyî Diyarbekir û ji wan xwest ku ji 19'ê mehê pê ve faaliyetên xwe yê li Kurdistanê bisekinînin. Çend roj piştî vê bûyerê, PKK'ê serokê SHP'ê yê Diyarbekirê revand û beyan da ku piştî 24'ê Çiriya Pêşîn wê nehêlin tu partiye burjuva çalakiyên xwe bikin. Ev her du biryarên PKK'ê li Tirkîyê him di nav raya-giştî ya gelê Tirk de him jî di nav rêvebirên dewlet, hukumet û çapemeniya Tirk de bû sedemên munaqesên fireh. Nemaze qedexekirina çapemeniyê -ya kolonyalîstan be jî- li Kurdistanê, di raya giştî ya Kurdan de zêde terefdar negirt.

Xelk ji ber terorê koç dike. Kî çiqas taqet û qudret wî heye, ew qas dûr ve diçe. Li Tirkîyê, herêmen Tirk lê hene êdî nahêlin Kurd li wê star bibin.

**Bûyera Licê**

Roja 22.10.1993'an bi bahana kuştina generalê Tirk Bahtiyar Aydin dewletê bi helikopter, tanq û topan êrişî Licê kir. Êriş bi hemû dijiwariya xwe 3 roj dom kir. Bi sîlehên giran, yê şewat û lavê bajar tarû mar kirin. Li gor agahda-

riyên dewletê 13 kes, li gor parlamenterên DEP'ê 30 kes hatin kuştin. Bi dehan kes birîndar bûn. Di nav birîndaran de gelek kes bi sîlahên şewatê birîndar bûne, heta li gor hin agahdariyan çend kes bi gazê birîndar bûne. Ev yek şik peyda dike ku gelo çekên kîmyayî hatin bi kar anîn?!

PKK'ê roja pêşî beyan da ku tu tîkiliyek wan ne bi kuştina general B. Aydin ve û ne jî bi êrişa PKK'ê ve heye. Hemû delaletên heta nuha xuya dikin dide nîşandan ku ev provakasyonê dewletê bû. Dewletê 7 rojan nehişt tu kes bê Licê û here. Heta nehiştin serokwezîra wan Tansu Çiller jî tîkewe Licê.

Li ser bûyerên dawîn û ya Licê YEKBÛN'ê beyanek derxist. Di beyanê de berpirsê bûyera Licê dewletê nîşandan û weha dibêje: "Rejima Tirkîyeyê, ji bo parastina qetliamên xwe, êrişên PKK'ê dike hincet, lê PKK diyar dike ku wan tu êriş ne birîye ser Licê. Wexta ku li hesabê dewleta Tirkîyeyê tê, nûnerên rojname û televizyonan tavilê dibin cihê ku bûyerê çêbûye. Lê vê carê destûr nedan nûnerên wan rojname û televizyonên ku îdeolojiya resmî diparêzin jî û tîkewin bajarê Licê. Serokê CHP'ê Deniz Baykal ligel talimata Wezîrê Dewletê, Necmettin Cewherî jî destûra ketina hundurê bajarê Licê nestend û ev jî dide xuyakirin ku dew-

let naxwaze rastiya qetlîma ku li Licê çêbûye derkeve ortê.

**YEKBÛN: kuştina gundiya zerarê dide doza me**

Li ser kuştina zarok û gundiyan ku PKK dike jî YEKBÛN'ê weha got: "...hefstendinê wek bi navê "ji nexşeyê xerakirina gundên perezgeran" li mezzaraya Derinceyê -girêdayî qeza Baykanê- kuştina 23 kesan ku pîrrianiya wan jin û zarok bûn; kuştina 39 gundiyan li qahwexaneyê gundê Yaviyê (li herêma Erzurumê) nayên taswîp kirin. Ev zerarê dide doza gelê me. Di vî warî de gelek dersên ku divê ji pratîka me ya derbasbûyî û bûyerên ku li dinyayê çêdibin, bêne derxistin, hene. Ew berdevkên dewleta ku bajarê Liceyê bi erdê re kir yek û nûnerên rojname û televizyonên ku parastina îdeolojiya resmî ya dewletê dikin, di warê êrişên Derinceyê û Yaviyê de derew û demagojiyê dikin. Yê wan jî hêsirên derewîn pê ve ne tiştêkî din e. Lê divê helwestê hêzên neteweyî û demokratîk di van waran de vekirî be. Gava çewtî hate kirin, divê ew çewtî bête qebûl kirin û di derheqa berpirsiyaran de tehqîqat bête kirin. Divê di warên weha de, hoyên şer jî nebe sedema helwest nestendinê".

**Mîrza Bextiyar**

**Osman Sebrî...**

yan raşt a. Labelê ez qîmişê yê nebena ki meselanê inasarinênan tira bipersa.

Ez vana: -Ameyîşê binê xeti ra pey, qe ti caran agêray welat?

Vano: -E. Ez çend rey şiya.

-Ti zaf mendî?

-Ez yew rey serr û nêma Ankara di menda.

-Ti şî Kolik?

-Ney.

Ez ki nê çiyar persena, derdê yê taw dênô, nezane

şarê ma ra lomey keno, vano "Ti ewnênî ayo ki bi kullî me'na (bi heme me'neyan) proleter o zî wayirê yew rûhê xebîsî yo."

Rojen Barnas qali ano nuştayanê yê ser, Dat Osman vano:

-Hemreşî yew kitabê mi veto.

Kitabî ma nawneno, kitabê şîran o. Ma newe nê kitabî vînenî. Ser o "Apo"

nuşte wo. Kelîma "Apo" y ma nawneno û vano "Apo yanî çî? Yanî qurretî!" Hêrsî reydi vatişê yê ra fam beno ki no namewo ki kitabî ser o nusiyawo zerba yê niyo. Vano "Tede zaf şaşey û kemaney zî estî", dima dewam keno vano "Nê kitabê mi ra no tena mi resawq".

*Dewamê ci esto.*

**Xaçepîrs**

**Amadekar: S. Rêving**

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

revajî). b-Ne kê, kamil. 4-a-Navek. b-Li Bulgarîstanê çemek. 5-a-Nîdayek (berevajî). b-Li hin herêman ji bo "agir" dibêjin. 6-Wezîrê Kulturî yê Kurdistanê Federe. 7-a-Vêca, îcar. b-Li hin herêman ji bo "rûn, bez" dibêjin. c-Notayek. 8-a- Di tewandina lêkeran de pêşpirtikek neyînîyê. b-Di alfabe de xwendina herfekê (berevajî). c-Xwedê. 9-a- Kurtenivîsa perê Tirkîyê. b-Tewirêk çûk/çivîk, (berevajî). c-Bi Farisî "ewr". 10-a Şaîrekî Kurd ku di navbera 1797-1855'an de di wexta dewleta Baban de jiyaye, ji Şarezorê ye, tê gotin ku gorra wî li Îstebolê ye (berevajî). b-Pronavek, zamî-rek. 11-a- Tembêl. b-Ne ronî (berevajî). 12-a)-Ne îro, ne sibe. b-Ne tarî (berevajî). c)-Dih, dê, qerîye (berevajî).

**Bersiva hejmara berê**

1	R	E	W	S	E	U	S	E	K	I
2	E	K	E	L	E	W	E	N	D	I
3	Z	E	R	E	V	A	G	M	E	T
4	L	E	Z	G	I	N	B	D		
5	K	O	D	I	K	A	S	I	V	A
6	R	F	N	A	R	I	A	W		
7	N	A	G	A	H	D	A	R	I	T
8	I	D	Z	E	P	I	S	K		
9	L	E	N	L	A	N	S	E	R	I
10	D	A	D	G	E	H	T	I	F	
11	A	S	W	I	V	A	T	F	O	
12	R	E	H	P	A	R	I	S	K	

**ÇEPERAST:**  
1-Nivîskarê Mewlûda Kurmancî. 2-a-Li hin herêman jibo "roj", "tav"ê dibêjin. b-Qeymax. 3-a-Navê Diyarbekirê kevî. b-Rengek. 4-Şaîrekî kilasîkê Kurd ku di sedsala 15-16'an de jiyaye, bi Dîwana xwe navdar e. 5-a-Ji vî pê de, jû pê de, ji vir û bi şûn de. b-Li Misira kevî Xwedayek. c-Navek. 6-a-Gep, hinarik. b-Ne tûj (berevajî). c-Qe nebe, hiç nebe. 7-a-Tendurustî, başî. b-Jûr, menzel. 8-a-Hac, agah, xeber (berevajî). b-Ekonomî. 9-a-Pêspirîtîka neyînîyê (berevajî). b-Wasitayek guhes-

tinê. c-Zevî, ax, xak. 10-a- Mirov bi wê cilên xwe rast dike (berevajî). b-Nêzî Batmanê herêmek ku ji alî petrolê ve dewlemend e û her weha navê eşîrêkê ye. 11-a-Ne "erê" (berevajî). b-Milletek. c-Pronavê kesmînê duwemîn. 12-Şaîr û nivîskar û tîkoşer Kurd ê navdar ku di 1905'an de li hêla Adiyemanê hatiye dinê, di 11.10.93'an de li Şamê çû rehma Xwedê.

**SEREJÊR:**  
1-a-Li Kurdistanê Ir-aqê bajarek. b-Ne fer, ne yek, cot. 2-Şaîr û filosofî millî yê Kurdan. 3-a-Du canî, bi bar, avis (be-



**Kultur û Polîtîka**

Riza Polat

**Di tevgera Kurdan de şîûra dîrokê**

Di jiyana siyasî û rewşenbîrî ya Kurdan de dawiya tekmlînebûyîna şîûrekî dîrokî her tim analîz û tespîtên xelet û beravêtî hatine kirin. Ew jî dikare bibe sedemê hevketinek û şerek texprîbkar a hundîrî. Şîrove û mewqûfên ne di cî de zerar û ziyane-ka mezin dikare bide pêşketina civatê. Piraniya îrovekirinên bûyerên ku di dîroka Kurdan de qewimîne yeko yeko û ji hev qutkirî tînin kirin. Ji ber vê yekê ye ku mantiqekî kamil û li ser hev dernakeve ortê. Mirov dikare bibêje ku helwêsta hinek tevger û rewşenbîrî Kurd derheqê kategorî û tebeqeyên çînî yê Kurdîstanê wek helwêsta çepê Tirk ê wextekê bû. Helwêsta çepê Tirkan a ku ji bo gelê Afrîka, Asya, Latîn Amerîka û yê wêkî din ji helwêsta li hember pîrsa Kurdî pir cudatir bû. Teverên li van mintiqên dunyayê rû didan ji wan re pêşverû, demokratîk û sosyalîst bûn, lê tevgera Kurd li cem wan her tim qewmî û paşverû bû. Ji bo qismek ji tevgera Kurd a Kurdistana Bakur jî axa û şêxên Kurdistanê paşverû û hevalbendên dewleta Tirk bûn û ji bo şoreşê jî asteng bûn. Lê li perçên din ên Kurdistanê eynî axa û şêx welatparêz, pêşverû û hetta hinek ji wan serokê tevgera Kurdî bûn.

Mantiqêke weha ne saxlem û kamil, rê dida ku axa û şêxên ku ji teref Mistefa Kemal ve hatine surgûn kirin û dest hatîye danîn ser malê wan, dibûn xayin û hevalbendên dewleta Tirk. Qismek ji tevgera Kurd şerê dijî axa û şêxîtiyê wek şerê li dijî empeyalîzm û dewleta Tirk dihesibandin. Di jiyana û şerê azadixawazî ya gelan de kesên ku bi dijmin re hevalbendî kirine hebûne û hinek ji wan serok eşîr, şêx û kesên feqîr jî bûne. Bes kesekî wek Kurda dijayetiya van tebeqe û kategorîyan wek dijayetiyeke esasî qebûl nekiriye û nexistiye program û belgeyên xwe.

Wek mîsal gelek Kurd bêyî ku sedemên hevalbendîya Şerefxanê Bedlîsî bi Yavûz Sultan Selîm re bizanibin û lêbikolin yekser Şerefxanê Bedlîsî xayin û peyayê Osmanliya dihesibînin û îlan dikin. Lê wexta ku mirov li sedeman dinîhere mirov tu alternatifek din li pêş Şerefxanê Bedlîsî nabîne. Di 1511'an de Şah Îsmail gazî nêzikî 25 axa û serokeşîrên Kurdan dike û wan heps dike. Piştî demekê piraniya wan axa û serokeşîran serbest berdide. Lê Şerefxanê Bedlîsî û çend axayên din bernade. Li ser vê yekê jî eşîra

Şerefxan hucûmî ser hepsê dikin û wî xelas dikin. Piştî vê bûyerê Şerefxan dijî Şah Îsmail mewqîf digre û bi Osmanîyan re dide û distîne.

Gelek caran wexta ku mirov li belge û nivîsên dijminên xwe dinîhere mirov baştir derheqê bûyerên xwe yê tarîxî de dibe xwedî fikr û malûmat. Di xebata Ugur Mumcu ya bi navê "Kurt Dosyası" (Dosya Kurdan) di rojnameya Cumhuriyetê de wek tefrîqa belav bû, çend nuqteyên balkêş hebûn. Yek ji wan nuqteyan ew bû ku dewleta Tirk a ku Mistefa Kemal tesis kirîye, li Kurdistanê tasfiyekirina tebeqeya axa û şêxan ji bo xwe kirîye wezîfa herî esasî. Çunkî M. Kemal baş dizanî ku di dîroka Kurdan de her tim yê ku serî hildane, şerê Osmanîyan, Ereban û Rûsan kirine her ew bûne. Mayîna wan wek tebeqeyekê her tim ji bo serhildanên Kurdan ên rojên pêş zemînek bû. Ji bo Dewleta Tirk jî tu ferqiyetek di navbera eşîrên ku serîhildane û nedane de tunebû. Çunkî wan jî baş dizanîbûn ku ev yek relatîf (îzafî) bû. Pîrî caran eşîr an axayekî li cem dewletê cih standîye, lê piştî demekê her eynî kesan li dijî dewletên dijmin serî hildane û doza mafên netewî kirine. Çi tesadufêke xerab e ku ji bo qismek hereket û rewşenbîrî Kurdan jî tesfiyekirina wê tebeqeyê jî wezîfeyekê esasî bû.

Em Kurd kêman caran problemên xwe bi dengêkî bilind û azad munaqêşe dikin. Ji ber vê yekê jî carna helwestên me yê pir dijî hev rû didin.

Ji bo çî pêwîst e ku mirov van probleman munaqêşe bike? Eger em îro van probleman munaqêşe nekin, xwe ji xeletî û kêmasiyên duhî xelas nakin. Îro ji bo hinek tevgerên ku li Kurdistana Bakur yê xwedî programeke sosyalîst zahmetiya îfadekirina wan ji bo helwestên wan yê derheqê Kurdistana Iraqê de heye. Îro li Kurdistana Iraqê gavên tînin avêtinê destûr û civata ku tê avakirin ne li gor destûr û siyaseteke sosyalîstî ye. Lê mewqîfên wan tevgeran li ser çî esasî, li gor çî ye? Bê şik helwestên wan rast e û di cî de ye, lê di siyaseta wan de û a di derheqê Kurdistana Iraqê de nakokî heye. Ji bona ku mirov wan nakokîya di helwestên xwe yê siyasî de rast bike, pêwîst e ku mirov bi cesaret û bi dengêkî bilind bikare wan probleman xwe munaqêşe bike.

**Li Parisê Pêşangeheke Ressamên Kurd**

Li Parisê bi alîkariya Wezaretê Kulture ya Kurdistana Başûr, Fondasyona France-Libertes û Fondasyona Action Sociale, bi navê "Ressamên Anfalê" ji alî Enstituya Kurdî ya Parisê wê pêşangehek (exposition/sergî) tabloyên ressamên Kurd were amadekirin. Pêşangeh ji 5.11 hetta 3.12.93'an vekirîye. Hunermendên ku bi tabloyên xwe beşdarî vê pêşangehê dibin ev in: Aras Abdulkerim, Namiq Alî, Serwet Enwer Sewz, Çimen Îsmail Rêşan, Alî Kerîm amîn, Îsmail Xeyat, Omar Resûl, Azad Şewqî.

**BEROŞ**



Mahmûd Lewendî

**Ez naxwazim guhê we bikşînim!**

Em însan çî ecêb in. Tiştê ku di hişê me de ye, di nav dilê me de ye em navivîsin, li şûna wê em diçin gotinên sînorkirî yê li gor civat û heval û dost û dijmin neqeherin wan dinivîsin. Ev jî di civatekê de ne tiştêkî tebîî ye. Hinek ji me radibin wekî ku tiştêkî nû kifş kiribin, te hew nihêrt qala tiştêkî welê dikin ku mirov ecêb dimîne.

Xwendevanîno, xuya ye we jî ji min fam nekîr. Ji xwe ez jî tiştê ku difikirim nikarim gişî raxim ser kaxezê. Wek filimekî di hişê min de derbas dibe, lê heta ku rêza pêşîn dinivîsim, malmîrata şerîta filmê ya di nav mêjîyê min de zû diçe. Îcar ez jî pê re nagihîjim, loma weha nivco-qurço derdikeve. Lê tişt nabe hema hûn jî nivco fam bikin!

Belê, em li ku ma bûn? Heqet ma min qala çî dikîr? Hi hîi! Nuha hat bîra min; însan, însanên ecêb û durû!

Mêrik qey cara pêşî ye hêka dixwe, îcar radibe û rûdine dibêje "hêk, hêk tiştêkî duri aqila ye. Gelo çima heval naxebitin ku hêka bixwin? Heta ku meriv hêka neke -pardon- nexwe mirov ji rewşa mirîşkê fam nake!" De were ji navê derkeve! Digotin "dînekî kevîrek avêtiye bîrekê, çil bîaqilan nikarîbûn derxistana". Ji xwe xiyar jî buha bûne. Dilê min jî diçe cacixa bî sîr. Hema bila qe bîn ji devê min were. Waye li Hîndistanê erd hejyaye, sî hezar mirî!

Ez dixwazim îşev romanekê binivîsim. Ma kê bi te girtîye? Ji xwe tu nikarî û nezanî û bêhêzî ya xwe jî dixî hustîyê hiş xwe yê belengaz.

Na! Hişê min ne belengaz e û ez ne bêhêz û nezan im. Lê Hz. Îsa li çarmîxa xistin. Xwîna ku ji kefa destê wî diherikî hê jî li ber çavên min e. Min di televîzyonê de dibû. Xuya ye ez ditirsim! Galileo jî ji mirinê ditirsiya. Lê ez bêtir ji civatê ditirsim. Civat ne wek mahkemê ye. Heqê xweparastinê nade te, nahêle tu ji xwe re abûqatekî jî bigrî. Bê taloq û bê ku lêbikole, di celsa pêşî de te mahkum dike. Muebbet an jî -bê ku fermana îdamê binivîse- te îdam dike. Yan jî endamekî xwe yî mirîd tayin dike, tê serê te ji laşê te difirîne. Ma kê çermê Hellacê Mensûr gura? Law ev însanên me çiqas durû ne. Li ber te xweş û geş

dikin, li pişt jî, te dîn û bêhiş dikin.

Ez di redaksiyona Armanç û Wanê de kar dikim. Yek rojname mehane ye, ya din jî kovareke çarmehane ye. Yekî çar roman derxistine. Min ya pêşî xwend, ez zanim ya çaran çawa ye. Ax ax, xwezka mala me li gund ba, ez jî ji we re li ber golika bama.

Do êvarî jinikê hevîr kir. Hevîr tîrş bû. Saet 19.30. Min televîzyon vekir. Li Moskovayê xaniyê parlamentoyê dişewite, 400 kes hatine kuştin. Yeltsîn demokrasîyê diparêze!

Ji oda din dengê jinikê: "hevîr tîrş bû, wê di ser re biçê!". Xwedê ji Yeltsîn re nehêle! Neyse saet di 21'ê de xeber hene. Perê min heba minê makîna hevîr bikirîya. Xwezka ez nuha li giravê Kanaryayê bama, minê xwe têr bida ber tavê. Üff! Ev firina jî hema germ dibe ha! Dîsa dengê jinikê "nan neşewite!". Nan û helaw hat bîra min.

Hundur germ e, ezê pacê vekim. Wîî, baran dibare. Qiyamet nêz e. Ez biçûk bûm, digotin berî qiyametê Diyarbekir wê bi avê xera bibe. Ez çiqas ditirsîyam. Xwezîka me mala xwe bibira bajarekî din.

Sylvia Plath 31 salî bû xwe kuşt, paşê bû nivîskareka navdar. Ez xwe nakujim, emrê min ne 31 e, min eskerî jî nekiriye. Ji xwe ez dixwazim vê çîrokê temam bikim.

"Nan neşewite!" Dengê jinikê ne xerab e; mezzo-soprano ye. Xwezka Pavarottî jî gundê me ba. Wê wextê minê bigota "Pavarottî yê Îtalî gundîyê me ye". Kî çî zane, belkî jî gundîyê me ye. Ma di wexta Osmanîyan de ji gundê me jî gelek "mêr" çûn seferberlikê, çûn şerê Balkanê, yek ji wan dibe ku ji şer reviyabe û çûbe xwe avêtibe bextê Îtalîyan. U tu ji yekî Swêregî re bibêji pîrika min Swêregî ye, dikare te bikuje.

"Tatarên Asya Navîn gava ku bixwestana mirovekî biezimandana şîvê, diçûn mala wî û bêyî ku jê re tiştêkî bibêjin guhekî wî dikîşandin".

Perê min tuneye ez naxwazim guhê kesî bikşînim. Vê mehê çar kesan guhê min bikîşandana wê çî xêrek mezin bikirana.

4.10.93

**ne karê aqila ye lê rast e**

**Amadekar: Hesen Mizgîn**

# Li gor lêkolînekê hemû heywanên bi çîçîk di jiyana xwe da 200 milyon caran nefes didin û distînin.

# Yek ji sebebên extiyarbûnê xwarina şekir e.

# Asansor cara pêşîn li Amerîkayê di sala 1850'î de hat bikaranîn. Di sala 1880'ê de li Ewropayê hat nîşandane.

# Pîveka kevintirîn pîveka giranî be ka ye û B.Z.Î (Berê Zayîna Îsa) nêzî

di sala 3800'an de li Misrê hatiye bikaranîn.

# Li Marsê salek 687 rojên dinê ye. Mars gera xwe ya li dora rojê 687 rojan de temam dike.

# Du muhendîsên ji Kanadayê bisiklêtek bi vitêza otomatîk çêkirine. Ev bisiklêt îro tenê li Kanadayê tê firotin.

# Hejmara hestîyên însanekî 206 e. Di zaroktiyê de ev hejmar 300e, lê hin hestî di dema gihîştinê de bi hevûdu re dihelin û dibin yek.

# Li gor metodên pîvana astronomîk, cîhana me 14 milyar sal berê hatiye avakirin.